

Berhemên Giştî Yê **Molière**



ÇIKÛS

Molière

aram

ŞANO

Weşanên Aram

Molière

Çikûs

Wergera ji Fransî

Yakup Karademir

Aramşano

Berhemên Giştî Yê Molière: II
Çikûs

Molière

Wergera ji Fransî: Yakup Karademir

Weşanên Aram 60

© Weşanên Aram

Weşanên Aram: Kewçêr 2003

Amadekirina Ji Bo Çapê:

Ömer F. Kurhan - Yakup Karademir

Bergsazî: Rauf Kösemen

Çapkirin û Cild: Berdan Matbaacılık

ISBN: 975-8242-60-1

Weşanên Aram

Evliya Çelebi Mah. Aybastı S. No:19/5

Beyoğlu İstanbul

Tel: 0212 292 89 40

Fax: 0212 292 89 41

AKTOR

HARPAGON, bavê Cléante û Élise û evîndarê Mariane.

CLÉANTE, lawê Harpagon, evîndarê Mariane.

ÉLISE, keça Harpagon, evîndara Valère.

VALÈRE, lawê Anselme, evîndarê Élise.

MARIANE, evîndara Cléante, ku Harpagon jê hez dike.

ANSELME, bavê Valère û Mariane.

FROSINE, jina bidek û rîp, dolabgêr.

HOSTE SIMON, simsar.

HOSTE JACQUES, xwarinpêj û ajokerê Harpagon.

LA FLÉCHE, xulamê Cléante.

QEWRAŞ CLAUDE, qewraşa Harpagon.

BRINDAVOINE, xulamê Harpagon.

LA MERLUCHE, xulamê Harpagon.

KOMISER û KATIBÊ wî.

Bûyer li Parisê derbas dibe

PERDEYA YEKEMÎN

Sehneya Yekem
(*Valère, Élise*)

VALÈRE

Hê çi bû, delala Élise, tu çima wiha xemgîn î? Ji ber ku te ji min re got ez ji te hez dikim û malê dinyê hemû da min, gelo tu wiha xemgîn bûyî? Ez ji kêfan dikim bifirim, lê mixabin ez dibînim ku dilê te bi ax û keser e! Ji min re bêje, ji ber ku te ez bextewer kirim tu poşman î? Belkî jî evîna min tesîr li te kir, gelo tu ji ber vê yekê poşman î?

ÉLISE

Na, Valère, ji ber hemû tiştê ku min ji bo te kiriye ez qet ne poşman im. Hezeke wisa bihêz û xweş min ber bi te dikşîne ku, he- ta taqeta min a ku ez bêjim xwezaya wiha nebûna jî nemaye. Lê tu rastiyê bixwazî, ev serketin min ditirsêne; ez pir ditirsim ku ev hezkirina min dikare weke zêdegaviyekê bê dîtin.

VALÈRE

Wey! Tu ji çi ditirsî, çima tu yê ji hezkirinê bitirsî, Élise?

ÉLISE

Ez çi zanim! Hezar tiştê ku mirov jê bitirse heye: hêrsa bavê min, tanên xizmên min, paşgotinîyên xelkê; lê ji van hemûyan jî bêtir, Valère, guhertina niyeta dilê te û wê helwesta herdem sar wek ya mirinê, ya we mêran li hemberî agirê evîneke saf û pak...

VALÉRE

Ax! Vê neheqiyê li min neke, min bi xelkê re muqayese neke. Ji her tiştê min şibhê bike, Élise, lê bila qet neyê bîra te ku ezê rojekê nankoriyê bi te re bikim; ez bixwazim jî ez nikarim bikim, ez ji te pir hez dikim û heta dawiya temenê xwe jî ez ê ji te hez bikim.

ÉLISE

Ax! Valère, herkes wiha dibêje. Wexta ku tê peyvê, hemû mêr wiha dibêjin, lê bitenê bi tevger û tepeşa wan ferqa wan derdikeve meyndanê.

VALÉRE

Madem bitenê tevgera me ferq û cudatiya me nîşan dide, wê gavê raweste hinekî û bipêjine, binêre bê tepeş û tevgera min çawa ye, paşê di derbarê evîna min de hukmê xwe bide. Bişik û şibheyên xwe yên ji ber tasewasa vala min tawanbar neke. Ez ricayê ji te dikim, bi vê şik û şibheya hisî ya ji heş û aqilan dûr ku li dilê min dide, min nekuje, fersendê bide min, ku ez bi hezar delîlî baweriya te bi pakî û durustiya evîna xwe bînim.

ÉLISE

Heyhat! Mirov çendî zû bi peyvên heskiriye xwe bawer dibel! Êrê, Valère ez dizanim ku dilê me bi hev re rast e û tu min naxapînî. Ez bawer dikim ku tu bi evîneke paqij ji min hez dikî û tu yê bi min re sadîq bî; ji vê yekê qet şubha min tune, derdê min ne ev e, lê ez dibêjim qey wê herkes henekê xwe bi min bike, ez li ber vê dikevim û ji bo wê xemgîn im.

VALÉRE

Lê çima tu wiha endîşe dikî û difikirî?

ÉLISE

Ku herkesî bi çavê min li te binêriya, tirs û fikara min ji tişteki neclima û tu mirovekî di ser pozê xwe re yî, ez ji bo te çî bikim têr

nake. Gava ku ez difikirim ez heq didim xwe ku dilê min ketiye mirovekî çendî pak û paqij. Bi ser de jî ez deyndarê te û tişteki wiha me, ku ez vê yekê ji hîra bikim Xwedê jî qehûl nake. Ew qeza diltezîn, ku bû sebebê ku em hev nas bikin qet ji ber çavê min naçe, ew dilêriya bêhempa ku tu ji bo min ji nav pêlên ava boş rizgar bikî, te jiyana xwe avêt xeterê; ew eleqeya jidil, ku te piştî ez ji avê derxistim nîşanî min da, ew dînîtiyên ku ji ber agirê vê evîna ne asteng û ne jî zeman pê kare û dawîya wan nayê; te malbata xwe, welatê xwe jî bicîh hişt û tu li vir mayî, ji bo ku tu min bibînî te eslê xwe înkarkir û ketî xizmeta bavê min. Van tiştan hemûyan helbet tesîreke mezin li min kir; ev jî têr dikiş ku ez soza ku min daye di cih de bibînim; lê ji bo hinekî din belkî têr neke ku heq bidin min; ez ne bawer im ku tu karibî rewşa min fêhm bikî.

VALÈRE

Ji van hemû tiştên ku te gotin, bitenê ez bi evîna xwe han didim ku layiqî te bim; gava em bîr ser tiştên ku bi serê te hati-ne, bavê te bixwe ji bo ku herkes heq bide te tiştê ku ji destê wî tê textsîr nake; çikûsiya wî ya nedîtî, bêînsafiya wî ya li hemberî zarokên wî, dikare bibe sebebê heqdana hîn gelek tiştên din ên nelirê. Êlîseyê delal, ji ber ku ez li rû te, bi vî awayî van peyvên dibêjim, li min bibore. Tu dizanî ku di vî warî de mirov nikare tişteki baş bêje. Lê di encamê de, ku weke ez guman dikim karibim dê û bavê xwe careke din bibînim, dê ne zor be ku em bavê te bînin ser rê. Ez bibêsebrî li benda xeberên lêzimên xwe me, ger ku hatina wan hinekî din biderengî bikeve, ezê bixwe biçim wan bînim.

ÉLISE

Wî! Valère, ez qurbana te me, tu xwe ji vir tev bidî ezê xwe bi-kujim; han bide ku tu têkevî serê bavê min, ku ji te hez bike.

VALÈRE

Tu dibînî ku ji bo vê yekê ez çî dikim, tu dizanî ji bo ez têkevim

xizmeta wî min çawa bihosteyî xwe pê ve meliqandiye; sirf ji bo ku ez têkevim çavê wî min hertişt qebûl kir, xwe ji şiklekî xiste şiklekî din. Welhasil ji bo ku bala wî bikşînim, ez li balê, her rojê dihim mirovekî din. Hin bi hin ez dikevim çavê wî; êdî ez tê dighêmin ku ji bo mirov xwe bi hinekan bide hezkirin, weke ku mirov xwiya wan dipesînîne û baweriya wan parvedike bike, kêmasiyên wan derxe ber perê ezmanan û ji hertiştê ku dikin re li çepikan bixe baştir tu riyeke din tune. Divê mirov ji zêde meliqandina bi wan re qet netirse; durûtiya wan çendî eşkere ji be, gava mirov serê wan germ bike yên herî qurnaz ji wê gavê pê dixapin. Gotinên herî rûşûştî, tiştên herî komîk ji gava tu pê serê wan girê bidî, pir birihetî tu dikarî bi wan bidî qebûl kirin. Her çend ev tiştê ku ez dikim wijdanê mirov qebûl neke jî; lê gava lazimiya mirov ji kesekî hebe, divê mirov li pey wî here; piştî ku ne bi wî awayî be mirov nayê zevtê, wê gavê qebehet ne ya kesê ku seriyên mezin dike ya yê ku ji bo mirov serê wî mezin bike dikare hertiştî bike ye.

ÉLISE

Lê çima tu han nadî ku birayê min jî piştgiriya te bike? Ku keçika qewraş sira me eşkere bike?

VALÉRE

Him wî, him yê din ezê çawa herduyan îdare bikim? Bav û kur du kesên ewende ji hev cihê ne, ne mumkun e ku mirov herduyan bi hev re derxe serî, lê tu jî ji aliyê xwe de, di ber dilê birayê xwe bide, ji samimiyeta di navbera we herduyan de îstîfade bike û wiha bike ku ew jî alîkariya me bike. Ev e hat, divê ez xwe veşêrim, biçim. Tu jî di vê navê de pê re bipeyive; lê hertiştî niha nebêje, te ji bo destpêkê çi minasib dît wê bêje.

ÉLISE

Ez nizamim, gelo ez ê karibim sira xwe jê re vekim?

Sehneya Duduyan
(*Clèante, Élise*)

CLÉANTE

Baş bû ku min tu bitenê dîtî, xwîşka min; ez dikim dîn bibim, ez dixwazim sira xwe ji te re jî bêjim.

ÉLISE

Derdê te çi ye, bêje, birayê min, ez amademe ku guhdariya te bikim. Tu dixwazî ji min re çi bibêjî?

CLÉANTE

Derdê sotinê nayê gotinê, lê kurt kurmancî ez dixwazim vê bêjim: Ez evîndar im.

ÉLISE

Tu evîndar î?

CLÉANTE

Erê, ez evîndar im. Lê ez serê te neêşînim, ez dizanim ez lawê bavê xwe me, ji bo vê jî ez nikarim ji gotina wî derkevim; bêyî ku em riza kesên ku em anîne dinyê bistînin biryara zewacê dan ne rast e. Xwedê ew kirine hakimê daxwazên me, li ser me hatiye ferzkirin ku em daxwazên xwe bêyî destûra wan pêk neynin, ji ber ku ew ne di temenê ku li dûv agirê evînê biçin û çavê wan tiştekî din nebîne de ne, ew di biryarên xwe de kêm diweritin û ew qenciya me ji me çêtir dizanin; ji dêvla ku em çavgiirtî li dûv azweriyên xwe herin em baweriya xwe bi dîtînan wan ên bitemkîn bînin çêtir e; nexwe bengîniya xortaniyê dê mirov gelek caran di kendalên bilind werbike. Ez van tiştan hemûyan ji bo ku tu zahmet nekî ji min re eynî tiştî dubare nekî dibêjim; jixwe ray li dil nabe, agirê evînê li tiştekî napirse. Ez ketim bextê te û Xwedê li min negire, bi min re nexeyde.

ÉLISE

Te, tu soz daye ya ku tu jê hez dikî, birawo?

CLÉANTE

Na, lê min biryara xwe ya di vî warî de daye; ez careke din ricayê ji te dikim, ji bo Xwedê tu yê ji min re li sebebên negerî ku ez dev ji fikra xwe herdim.

ÉLISE

Ma tu min çî dihesibînî, birawo, qey tu min ewende xam dibînî?

CLÉANTE

Na, xwîşka min; lê tu derdê evînê nizanî: tu nizanî evîneke jidil çendî tesîrê li mirov dike; ez dizanim tu keçeke çendî bîrewer û bidebî, ez ditirsim ku tu rexneyan li min bikî.

ÉLISE

Heyhat! Birawo, qet bahsa bîrewerî û bidebûna min neke. Keskî ku di emrê xwe de carekê jî be şaşî nekiriye heye! Ger ku ez dilê xwe ji te re vekim, dibe ku ez li ber çavên te ji te bêdebtir xuya bim.

CLÉANTE

Ax tu ji min re çî dibêjî! Xwedê bike ku dilê te jî wek yê min...

ÉLISE

Ka em berî meselê te xelas bikin, niha ji min re bêje tu ji kê hez dikî, hezkiriya te kî ye?

CLÉANTE

Keçeke ciwan e, ku ev serê demekê ye li van deran rûdinê, tu dibêjî qey Xwedê ew ji bo ku herkes aşîqê wê bibe çêkiriye. Min di emrê xwe de keçeke wiha bedew nedîtibû, xwîşkê; çawa ku min ew dît dilê min ketê. Navê wê Mariane ye û bi dayika xwe ya pîr a ku çibigre heroj nexweş e re diji. Û dilê keça wê ya delalî ewqas

bi ser de ye, ku mirov nikare pesn û beradên wê bide. Ewende lê miqate ye, xwe bi ser de dikuje û derdê wê pê dide jibîrkirin, ku tu bibînî wê dilê te li te here. Bi her hal û hereketên xwe şêrîna li ber dila ye, di her tevgera wê de nazikî û nazenînî xuya ye. Helimî û milayimiyeke wê ya pir şêrîn, dilgeşiyeye dilbijîn, kubariyeke ku mirov heyran û hişmetkar dihêle, paşê... Ax! Xwîşkê, xwezka ku te ew bidîta.

ÉLISE

Piştî van gotinan hemûyan, hema ez bûm weke ku min ew dît; ji bo ku ez nas bikim bê kê ye, çi kes e, tu jê hez dikî ji bo min bes e.

CLÉANTE

Min ji hinekên din bihist ku hal û wextê wan ne xweş e, tevî ku bi hejarî debara xwe dikin, dîsa jî hatiniya wan têra mesrefa wan nake. Bifikire, xwîşka min, başkirina rewşa kesekî/e ku mirov jê hez dike; temînkirina hin pêdiviyên biçûk ên malbateke pirûpak bêyî ku haya kesekî jê çêbibe dê çendî bexteweriyeke mezin bide mirov; ji ber çikûsiya bavê min, ji çêj û tama bexteweriyeke wiha mahrûm bûn û tiştek ji destnehatina min nîşandana delîleke herî biçûk a eşqa xwe ji wê şox û şengê re, ji bo min çi êşeke dijwar e.

ÉLISE

Erê, ez baş tê digihîjim, keko, ez dizanim ku tu çendî li ber vê yekê dikevî.

CLÉANTE

Ax! Xwîşkê, ez ewqas liber dikevim ku kesek bi derdê dilê min nîzane. Qet zilmeke wiha ji xeynî me bi serê kesekî din de ne hatiye, ev çi ye tiştê ku em ji destê vê çikûsiyê dikşînin? Em ji hertîstî bêpar in, em zengîn bûne çi ye, piştî di dema ku mirov karibe zewqê jê bistîne tiştek nekeve destê mirov, piştî ku ji bo debar û abûra xwe jî, mirov mecbûr bimîne ji vî alî, wî alî deynan bike, her wiha jî piştî ku ez û te, ji bo ku cilên mirov pê karibe derkeve nava însanan

lixwe bikin heroj dikan bi dikan bigerin û mecbûr bibin li yekî ku hideynê xwe tiştêkî bide me bigerin, dê ev dewlemendî bibe çi? Welhasil min xwest ez bi te re bipeyivim, ji bo ku tu alîkariya min bikî, tu dikarî li bin zimanê bavê min bigerî! Ew derbarê van hisên min de çi difikire; ger ku li hemberî vê yekê derkeve, ezê bi destê delala ber dilê xwe bigrim birevênim, ji van deran herim, Xwedê çi kiribe qismetê me, em dê qîma xwe pê binin. Ji bo vê jî ezê biçim herdera ku gumana min heriyê, da ku bi deyn hin pereyan peyde bikim. Xwîşka min ger rewşa te jî wek ya min be û bavê min li di-jî daxwaza me derkeve, em dê herdu jî wî bicih bihêlin û em ê ji vê ezaba gorê, ku ev demeke dirêj e em ji ber çikûsiya wî dikşînin, rizgar bibin.

ÉLISE

Rast e, her roj hîn bêtir ji kirina tiştên ku şekala rehmetiya diya me davên ser banî bi şûn de namîne, bi ser de jî...

CLÉANTE

Dengê wî tê. Ji bo ku em gotina xwe temam bikin, divê em hinekî ji vir dûr herin; paşê emê hêza xwe bikin yek da ku han bidin hinekî dilê wî yê kevirî nerm bikin.

*Sehneya Sisiyan
(Harpagon, La Flèche)*

HARPAGON

Aniha biceheme here ji vir, zêde nepeyive. Heydê, nesequine here ji mala min, dizekê dizek, serseriyê heram.

LA FLÉCHE

Min di emrê xwe de kesekî wek vî pîremêrî melûn nedîtiye, peyva min ji civatê der, tu dibê qey şeytanqûnkî bûye.

HARPAGON

Çi vinvina te ye, tu çi dibêjî?

LA FLÉCHE

Tu ji bo çi min diqewirîn?

HARPAGON

Bi serê te ketiye, sextekar, tu yê ji min hesab bipirsî? Zû biqîşte, berî ku ez mirina te bînim.

LA FLÉCHE

Min çi kiriye ji te?

HARPAGON

Te çi kiriye kiriye, ez ji te re dibêjim derkeve, here ji mala min.

LA FLÉCHE

Axayê min, lawê te ji min re got li benda min be.

HARPAGON

Biçe li kolanê li hêviya wî be, êdî bese ku tu xwe weke ilç li nav mala min rep dikî, dinêrî bê çi dibe û çi diqewime, ji hertiştî ji xwe re payekê derdixî. Ez êdî qet naxwazim ku çavên te, hergav wek yên casûsan li kar û barên nav mala min bin, hergeleyekî ku çavên wî yên kundikî hertim li vî alî wî alî li min û tevgera min be da ku tiştêkî bidize, hertiştê min bixwe, min navê ku careke din çavê min pê keve.

LA FLÉCHE

Tu bi xatirê Xwedê kî, ka kesek dikare tiştêkî ji te bidize? Tu ew mêr î, ku mirov karibe diziyê ji te bike? Tu hertiştên xwe naxî paş heft quflan, bişev û biroj li ber wan nobetê nagirî?

HARPAGON

Ma tu li benda kêfa min î, tiştê ku bê hisaba min ezê veşêrim, yê ku bê hesabê min ez ê li ber nobetê bigrim, ji te re çi ! Tu nabînî

binêre, clorhawîrê min tije casûs in, li benda min in, dinêrin bê ka ez çi dikim?

(Di ber xwe de hêdîka dibêje)

Xwedê bike ku cihê perê min nedîbe.

(Bi dengê bilind)

Tu neçî li vî alî wî alî nebêjî ku min perê xwe li mala xwe veşartine?

LA FLÉCHE

Qey perên te yên veşartî hene?

HARPAGON

Na, bênamûs, ez ne vê dibêjim.

(Xwe bixwe)

Ezê dîn bibim.

(Bi dengê bilind)

Ji ber fesadiya xwe, tu neçî ji kesî re nebêjî pereyên veşartî li mala wî hene, ez vê dibêjim.

LA FLÉCHE

Hê! Pereyên te hene tunene ji min re çi ye, ferq nake, kê heta niha xêr ji te dîtiye?

HARPAGON

Zimanê te pir dirêj bûye. Ezê niha vê zimandirêjiya te nîşanî te bidim.

(Destê xwe radike ku sillehekê dênîyê)

Ez ji te re careke din dibêjim biceheme, derkeve ji vî hundirî.

LA FLÉCHE

De baş e! Ez derdikevim diçim.

HARPAGON

Raweste. Belkî te tiştekî min dizî be?

LA FLÉCHE

Ezê çi yê te bidizim?

HARPAGON

Were vir, ez binêrim. Destê xwe veke nîşanî min bide.

LA FLÉCHE

Ev e destê min.

HARPAGON

Yê din.

LA FLÉCHE

Yê din?

HARPAGON

Erê yê din jî.

LA FLÉCHE

Ev e yê din jî.

HARPAGON

(Derpiyê La Flèche nîşan dide)

Te tiştekek nexistiye hundirê vî jî?

LA FLÉCHE

Tu bixwe binêre.

HARPAGON

(Devdelingên derpiyê wî dipelîkêne)

Ev derpiyên wiha mezin ji bo veşartina tiştên diziyê peyde nabin; min pir dixwest ku ez yekî ku wan ji bo van karen wiha bikartîne bi sêdarê dakirî bibînim.

LA FLÉCHE

(Di ber xwe de dibêje)

Ax! Mirovekî wiha çendî misteheqê tiştê ku jê ditirse ye! Çen-

dî dê dilê min lê rihet bûbûna, ku min tişteke jê bidiziya!

HARPAGON

Hi?

LA FLÉCHE

Çi?

HARPAGON

Tu bahsa diziya çi dikî?

LA FLÉCHE

Ez dibêjim ku tu heta li derpiyê min geriyayî, da ku zanibê bê min tişteke te diziye yan na.

HARPAGON

Helbet ez ê li te bigerim. Di wê navê de li berîkên La Flèche digere.

LA FLÉCHE

(Di ber xwe de)

Xwedê bela çikûsiyê û çikûsan tev de bide.

HARPAGON

Çi? Te çi got?

LA FLÉCHE

Te got, min çi got?

HARPAGON

Erê, çikûsî, çikûs, çi vine vîna te ye, tu di ber xwe de dipeyivî?

LA FLÉCHE

Ez dibêjim Xwedê bela çikûsiyê û çikûsan bide.

HARPAGON

Qesta te kî ye?

LA FLÉCHE

Qesta min çikûs in.

HARPAGON

Kî ne ev çikûs?

LA FLÉCHE

Mendebûr û nekes in.

HARPAGON

Me fêm kir, tu van peyvan ji kê re dibêjî?

LA FLÉCHE

Ji te re çî, ku ez ji kê re dibêjim?

HARPAGON

Çawa ji min re çî, tu van peyvan ji kê re dikî?

LA FLÉCHE

Naxwe tu dibêjî qey ez bahsa te dikim?

HARPAGON

Ez çawa fêm dikim ew bi serê te neketiye, tu ji min re bêje, tu van peyvan ji kê re dibêjî?

LA FLÉCHE

Ez ji kê re dibêjim... ez ji kumê xwe re dibêjim.

HARPAGON

Neke ku ez destê xwe bi te bikim, ez ê kumê te nîşanî te bidim.

LA FLÉCHE

Qey tu nahêlî ku mirov ji çikûsan jî xeber bide?

HARPAGON

Na, lê bes bîke çimeçim, zimandirêjiya ku tu dikî bes e. Hiş be.

LA FLÉCHE

Min bahsa kesî nekiriye.

HARPAGON

Ku peyveke din ji devê te derkeve, ezê mirina te bînim.

LA FLÉCHE

Kî ji xwe bişil be bila bêje.

HARPAGO

Tu hiş nabî?

LA FLÉCHE

Temam, ji bo xatirê te ezê hiş bibim.

HARPAGON

Ha, ha!

LA FLÉCHE

(Berîkeke saqoyê xwe nîşan dide)

Binêre, ev e berîkeke din; icar dilê te rihet bû?

HARPAGON

Derxe, bîne bê çî bi te re heye, bide min.

LA FLÉCHE

Ezê çî bidim te?

HARPAGON

Tiştê ku te biriye.

LA FLÉCHE

Tu tişteki te bi min re tuneze.

HARPAGON

Sond bixwe, bêje bi Xwedê?

LA FLÉCHE

Bi Xwedê.

HARPAGON

Heydê oxurbe ji te re, biçe cehnema xwe!

LA FLÉCHE

Bi ser hemû ked û renca min de, ev e heqê min?

HARPAGON

Ku te tişteki biribe, li te bi jahr û nekedê be. Vî roviyê xulêm kezêba min reş kir, her ku ez vî qopê lewîti dibînim hîletê min diçe.

*Sehneya Çaran
(Élise, Cléante, Harpagon)*

HARPAGON

Tu rastiye bixwazî, li malê veşartina pereyekî pir ne hêsan e; helal be ji yê ku kariye hemû perê xwe tîxe ciyekî saxlem û bitenê tiştê ku ji bo mesrefa wî lazim be bi xwe re bigerîne. Di maleke wiha mezin de peydekirina quncikeke ku kesek biser venebe, ne karê her kesî ye; tu bêjî qase bila ji min dûr be, haweriya min bi tiştên wiha nayê; tişteki wiha ji bo dizan peyde nabe, yê ku bê dê herî her tiştî herê xwe bi-de wê. Ez nizanim, gelo min haş kir ku min ew deh hezar ekuyên

duh li min vegerandin, li nav hexçeyê xwe xiste bin erdê. Deh hezar ekuyên zêrînî, bi mirov re pereyekî pir e...

(Di wê navê de xwîşk û birayê ku bi hev re hêdî hêdî dipeyivîn xwiya dibin)

Wî ji bo Xwedê! Min fikir xwe bixwe bida çest; tavê li serê min xistiye qey, ez dibêjim qey tiştê ku di hişê min re derbas bû, min bidengê bilind got. Çi ye, çi bû?

CLÉANTE

Tiştêk tune ye, bavo.

HARPAGON

Hûn ji zû de li wir bûn?

ÉLISE

Na, em niha nû hatin.

HARPAGON

We tiştêk bihîst...

CLÉANTE

Bihîstina çi, bavo?

HARPAGON

Çik...

ÉLISE

Çika çi?

HARPAGON

Tiştên ku min digotin?

CLÉANTE

Nexêr.

HARPAGON

Belê, belê.

ÉLISE

Bibore.

HARPAGON

Ez dibînim ku hin peyv hatine guhê we. Te dît ez ji xwe re difikirîm, min digot peydekirina peran çendî zor bûye, helal be ji wî yê ku bikaribe deh hezar ekû peyde bike!

CLÉANTE

Me newêribû em peyva te bibirin, ji bo wê em nedihatin ba te.

HARPAGON

Vaye ez ji we re dibêjim, ji bo hûn şaş tînegihên û nebêjin qey ku min gotiye deh hezar ekuyên min hene.

CLÉANTE

Em qet tîkilî karê te nabin.

HARPAGON

Ax xwezka deh hezar ekuyên min hebûna, min tişteki din ji Xwedê nedixwest!

CLÉANTE

Ez bawer nakim ku...

HARPAGON

Ku ewqas perên min hebûna şûr simbelên min nedibiri.

ÉLISE

Ev tişt hemû...

HARPAGON

Çendî lazimiya min jî jê heye.

CLÉANTE

Ez dibêim qey...

HARPAGON

Pereyekî wiha dê pir bi kêrî min bihata.

ÉLISE

Tu...

HARPAGON

Û min ê wek niha gazinên xwe nekira, negota ev çi dewrane, çi hejariye bi serê min de hatiye.

CLÉANTE

Ji bo Xwedê! Bavo, heqê te ku tu gazinan bikî tune, herkes dizane ku mal û milkê te li qirikê ye.

HARPAGON

Çawa? Mal û milkê çi! Kî dibêje hişk derewan dike. Tiştek ji vê derewê mezintir tune, û yên ku van derewan hemûyan dikin bênamûs in.

ÉLISE

Xwe qet neqheerîne, heye heye, naxwe te ji hinekan diziye.

HARPAGON

Kesî tiştekî wiha ditiye, zarokên min hixwe îxanetê bi min re dikin û dijminantiya min dikin!

CLÉANTE

Me got mal û milkê te heye, tu zengîn î, ma ev dijminantî ye!

HARPAGON

Erê, ji ber van peyvên we û mesrefên ku hûn dikin, wê rojekê hinek bêjin qey xezîneyên min hene, hên destê xwe di qirika min xin û min bikujin.

CLÉANTE

Me mesrefa çi kiriye?

HARPAGON

Mesrefa çi? Ew xeml û xêza ku dema hûn derdikevin nav kolanên bajêr bixwe dadikin, çi ye? Ji bo vê min duh bi xwîşka te re şer kir; lê tu jê xirabtir dikî. Ji Xwedê jî guneh e ku mirov tiştê wiha bike; tiştên ku hûn li xwe dikin, ku mirov li ser fayizê bide îdara malekê rihet pê dihe. Belkî min bîst carî ji we re got kurê min, ev tevger û tepeşa we na-keve serê min: Te xwe bi awayekî seyr daye kuhariyê; ji bo ku tu xwe ewqasî bixemilînî, divê tu min tazî bikî.

CLÉANTE

Weh! Ezê çawa te tazî bikim?

HARPAGON

Ez çi zanim? Ji bo vê xeml û xêza xwe, tu pereyan ji ku peyde dikî?

CLÉANTE

Tu ji min re dibêjî, bavo? Ez bi qumarê dilîzim; şansê min pir baş e, hemû perê ku ez qezenc dikim, ez ji xwe re didim bi cil û bergan, li bejn û bala xwe dikim.

HARPAGON

Tu qet baş nakî. Madem şansê te heye gava tu dilîzî, divê tu ji vê yekê îstîfade bikî, pereyê ku tu qezenc dikî divê tu li ser fayizeke maqûl bidî, ku roja lazim hû tu bê pere nemînî. Hertîşt li aliyekî, ji bo Xwedê tu ji min re nabêjî, ew qurdêleyên ku tu bi xwe dadikî û bixwêre derin ji bo çi ne, ji bo şalê te ji te nekeve ma pênc şeş doxîn têra te nakin? Piştî ku porê mirov hebe û perê mirov lê neçin, mirov ne mec-

hûr e ku pereyên xwe bide bi perûkan û beleheq havêje. Ev perûk û qurclêlên te, bi kêmanî bîst pistolî dîkin;* û bîst pistolê te jî şalê te, te-qabûlî hijde banknot, şeş qurûş û heşt pere fayizê dike.**

CLÉANTE

Xehera te ye.

HARPAGON

De ka em dev ji vê meselê herdin û ji xwe re hinekî bahsa tiştên din bikin. Wey? Tu dibê qey ji bo pereyên min bidizin çav dîkin hev. Ma-na vê yekê çi ye?

ÉLISE

Ez û birayê xwe, em herdu jî dixwazin ji te re tiştêkî bêjin, lê em dibêjin gelo kî ji me divê berî bêje.

HARPAGON

Tiştên ku ez jî ji we herduyan re bêjim hene.

CLÉANTE

Bavo, me dixwest di derbarê zewacê de, em bi te re bipeyivin.

HARPAGON

Min jî dixwest ez di derheqê vê yekê de bi we re bipeyivim.

ÉLISE

Tu hirast dibêjî, bavo!

HARPAGON

Îcar çima tu diqûrî? Tu ji peyva zewacê yan ji zewacê bixwe ditirsî, keça min?

* Pistoleyek 11 frankî dike.

** Li gor fermana qirêl fayiza fermî ya wê demê % 8.3 ye, lê hesabê Harpagon % 12-an bêtir digre.

CLÉANTE

Bi awayê ku tu bifikirî, zewac dikare me herduyan jî bitîrsîne; em di-tirsin ku tiştê tu bixwazî ne li gorî dilê me be.

HARPAGON

Hinekî sebir bikin. Qet ecele nekin. Ez dizanim ku kî layiqî we herduyan e; tiştê ku ez munasib dibînim ne tu û ne jî xwişka te dê karibe li hember derkeve. Divê em jî Cléante dest pê bikin: Ji min re bêje, te qet keçeke bi navê Mariane ku li van der û doran rûdinê diye?

CLÉANTE

Erê, bavo.

HARPAGON

Û te?

ÉLISE

Min navê wê bihîstiye.

HARPAGON

Tu vê keçikê çawa dibînî, lawê min?

CLÉANTE

Keçikeke pir şêrîn e.

HARPAGON

Serçav, bejn û bala wê?

CLÉANTE

Gelek delal û rind e, her wiha pir bîaqil e jî.

HARPAGON

Tevger û tepeşa wê?

CLÉANTE

Pir xwînşêrîn e, bêguman.

HARPAGON

Tu dibêjî keçeke wiha layiq e, ku mirov wê biecibîne?

CLÉANTE

Helbet, bavo.

HARPAGON

Bûkeke pir munasib e, ne wiha?

CLÉANTE

Gelekî munasib e.

HARPAGON

Bi raya te dê bibe kevaniyeke baş?

CLÉANTE

Bêşik.

HARPAGON

Dikare mêrê xwe razî bike, ne wisa?

CLÉANTE

Bêguman.

HARPAGON

Problemeke biçûk heye; ez ditirsim ku serweta wê kêmbê, ez ji vê ditirsim.

CLÉANTE

Wî! Bavo, gava ku mirov bi jîneke xwedî van hemû meziyetan re, bidilê xwe bizewice, ma mirov li ber mal, milk û serwetê dinêre?

HARPAGON

Bibore, bibore. Lê ev heye, ku serweta wê weke ku mirov hê-
vî dike nebe, mirov dikare vê yekê bi awayekî din telfî bike.

CLÉANTE

Xebera te ye.

HARPAGON

Ez pir kêfxweş bûm ku tu jî wek min difikirî; ji xwe nazikî û
şêrîniya wê dilê min li min dibe, ku hinekî serweta wê jî he-
be, min biryar daye ezê pê re bizewicim.

CLÉANTE

Hi?

HARPAGON

Çi bû?

CLÉANTE

Te got min biryara çî daye...?

HARPAGON

Biryara ku ez ê bi Marianeyê re bizewicim.

CLÉANTE

Kî, tu? Tu yê bizewicî?

HARPAGON

Erê, ez, ez, ez. Çi bû, çî bi te hat?

CLÉANTE

Bi carekê re ez gêj bûm, dilê min vexeliya, ez diçim.

HARPAGON

Tiştêk nabe. Zû biçe pixêriyê tasek ava sar vexwe. Tu li vî qeş-
merê ku jixweber dilê wî lê dere, xortê malê bi qende ferûcekê
ruh tê tune. Ev e keça min, biryara ku min ji bo xwe dabû ev
e. Ku tu li birayê xwe dipirsî, ez ê jê re jinebiyeke ku vê sibê ji
min re bahsa wê kirin bînim; û ez ê te jî bidim senyor Anselme.

ÉLISE

Tu yê min bidî senyor Anselme?

HARPAGON

Erê, mirovekî kemlan, giran, biedeb û bîaqil e, hîn pêncî salî ye,
her wiha dibêjin pir zengîn e jî.

ÉLISE

(Birêzdarî serê xwe li ber bavê xwe xwar dike)
Ez qet naxwazim bizewicim, bavo, bi îzna te be.

HARPAGON

(Li havê keça xwe dike)
Bi îzna te jî be, keça min, şêrîna min, ez jî dixwazim ku tu bize-
wicî.

ÉLISE

Li min bibore, bavo.

HARPAGON

Tu li min bibore, keça min.

ÉLISE

Ez dibim qewraşa mîrza Anselme; lê bi îzna te be, qet niyata min
tune ku ez pê re bizewicim, bibim jina wî.

HARPAGON

Ez jî xûlamê keça xwe me; lê, bi îzna te be, tu yê aniha îşev pê
re bizewicî.

ÉLISE

Çi, îşev?

HARPAGON

Erê, îşev.

ÉLISE

Tiştê wiha nabe, bavo.

HARPAGON

Wê bibe, keça min.

ÉLISE

Na.

HARPAGON

Belê.

ÉLISE

Ez ji te re dibêjim, na.

HARPAGON

Ez jî ji te re dibêjim, belê.

ÉLISE

Tu nikarî min mecbûrî tişteki wiha bikî.

HARPAGON

Tu mecbûr î.

ÉLISE

Ji dêvla ku ez mêrekî wiha bikim, ez xwe bikujim çêtir e.

HARPAGON

Tu qet nikarî tişteki jî bikî û tu yê pê re bizewicî. Tu ji xwe re li ziman dirêjiya wê binêrin! Kesî tiştê wiha dîtiye, çima keç li hemberî bavê xwe wiha bipeyivin?

ÉLISE

Ma kesî tiştê wiha dîtiye ku bav keça xwe layiqî zewaceke wiha bibîne.

HARPAGON

Kî dikare ji qismetekî wiha re tişteki bêje; ku herkesî negot helalî xweş be, ez bi tişteki nizanim.

ÉLISE

Ku kesekî aqilê wî li serê wî be munasib dît, ez jî bi tişteki nizanim.

HARPAGON

(Ji dûr ve Valère nîşan dide)

Ev e Valère. Tu dixwazî ku em ji wî bipirsin?

ÉLISE

Erê, bila ew bêje.

HARPAGON

Ew çi bêje tu yê bi ya wî bikî?

ÉLISE

Erê, ew çi bêje ez ê bi ya wî bikim.

HARPAGON

Madem wiha ye baş e.

Sehneya Pêncan
(*Valère, Harpagon, Élise*)

HARPAGON

Were vir, Valère. Me tu ji xwe re kirî hakim, ka bêje bê ji min ji keça min, xebera kê ji me ye.

VALÉRE

Bêgûman xebera te ye, Mîrza.

HARPAGON

Tu zanî em bahsa çi dikin?

VALÉRE

Na, lê ne mîmkun e ku tu neheq bî, ku tu çi bêjî hertim wek te derdikeve.

HARPAGON

Ez îsev dixwazim wê bidim mêrekî him bîaqil him jî zengîn; bêşermê li ber difna min radiibe, dibêje ez tiştê wiha qebûl nakim. Di derbarê vê yekê de tu çi dibêjî?

VALÉRE

Tu fikra min dipirsî?

HARPAGON

Erê.

VALÉRE

Weleh...

HARPAGON

Çi?

VALÉRE

Ez dibêjim ku di eslê xwe de ez jî wek te difikirim; û ne mimkun e ku tu neheq bî. Lê ew jî bi temamî ne neheq e, ji ber ku...

HARPAGON

Çawa? Mîrza Anselme qismetekî bêqusûr e. Mirovekî kubar, zarşêrîn, kemlan û giran, bîaqil û esîlzade ye.* Û ji zewaca wî ya pêşîn jî zaro-kên wî tunene. Ma dê yekî ji wî baştir bibîne?

VALÉRE

Ev yek rast e. Lê ew jî dikare bêje ku wiha hakhaka, ecele nabe û hinekî jî wext divê da ku bifikire bê dilê wê jî wî zatî...

HARPAGON

Fersend masî ye hergav nayê dest. Fersendeke wiha careke din bi destê min nakeve, mêrik bêcihêz keçikê dixwaze. **

VALÉRE

Bê cihêz?

HARPAGON

Erê

VALÉRE

Wa! Wê gavê tiştekî ku ez bêjim tune ye. Tu dizanî ev sebebeke wiha ye ku kesek nikare li hember derkeve; divê mirov qebûl bike.

HARPAGON

Ev ê ji bo min lihevhatineke pir baş be.

* Un gentilhomme qui est noble... mana wê kesê ku ne ji bavê xwe de lê paşê un-wana esaletê wergirtiye. Ji ber ku wê demê qirêl li hemberî xizmet an tiştekî maddî dikaribû unwana esaletê bidana kesekî.

** Peyva 'Dot' bi fransî cûre qeleneke ku wexta keç mêr dike ji aliyê bavê wê ve tê dayin. Me li şûna wê peyva 'cihêz' bikaranî

VALÉRE

Muheqeq, kesek nikare herevajiya wê bêje. Tu rastiye bixwazî keça te dikare bêje zewac karekî hîn girîngtir e, ku mirov nikare texnîn bike bê çendî girîng e; ji her ku hidirêjiya temenê xwe, mirov dikare bextewer an bedbext bibe; gava mirov biryareke wiha ku dê hetî mirinê tesîrê li jiyana mirov bike bide, divê mirov baş bifikire.

HARPAGON

Û bêcihêz!

VALÉRE

Gotina te ye. Ev besî her tiştî ye, me fêm kir. Dîsa jî hin dikarin bêjin, gava ku di rewşeke wiha de mirov guhdariya riza keça xwe jî bike, hîn baştir e; her wiha ferqa di navhera temenê herduyan de, newek-heviya hiş û xûyê herdu aliyan dikare bibe sebebê zewaceke bibela û musîbet.

HARPAGON

Ku bêcihêz be.

VALÉRE

Helbet! Kî dikare bêje ev ne baş e. Herkes dizane; kî dikare berevajiya vê bêje? Lê ev jî nayê wê manê ku hin havên ji perên ku karibin bidin bêtir, hez dikin ku keçên wan bextewer bin tunene; ew naxwazin keçên xwe bikin goriyên berjevendiyên xwe, gava keçên xwe dizewicînin ji her tiştî bêtir li kêfxweşî û rihetiya wan, li hebûn û nebûna meziyetên ku karibin rûmet û namûsa wan biparêzin dinêrin, him ku...

HARPAGON

Bêcihêz jî?

VALÉRE

Rast e; li hemberî tiştekî wiha kesek nikare devê xwe veke, bêcihêz! Tu sebebeke ku mirov li diî tiştekî wiha derkeve heye?

HARPAGON

(Li aliyê bexçe dinêre)

Hiş hin! Tu dibê qey dengê reyîna kuçikekî hat guhê min. Hinek nehatibin ku perên min bidizin? Xwe tev nedin, ez aniha têm.

ÉLISE

Tu henekên xwe bi min dikî, Valère, ev çi peyvin tu jê re dibêjî?

VALÉRE

Ji bo ku ez wî nexeyidînim, him ez li têla wî dixim da ku em bigên meqsed û miradên xwe. Ku min hisên xwe rastarast jê re bigota, me yê îşê xwe bi destê xwe xera bikira; hin mirov hene bitenê mirov kare bi derew û delewêran wan bîne ser rê, gava tu ji wan re rastiye bêjî vediciniqin, nayên rayê, ji ser yek û duduya xwe nayên xwarê, naxwazin rast bi rê de herin, ji bo mirov yên wiha bîne ser riya rast divê mirov bi dora wan keve, wan îkna bike. Gava baweriya wan bi te hat, tê wan bibe ser avê û bîne, deng nakin, paşê...

ÉLISE

Lê ev zewac, Valère?

VALÉRE

Ji bo ku em rê lê bigrin em ê çareyekê jê re jî bibînin.

ÉLISE

Ku îşev be, ez ê çi xweliyê li serê xwe bikim?

VALÉRE

Divê tu hinekî moletê bixwazî, xwe nexweş mexweş bikî.

ÉLISE

Lê ku gazî doktor bikin, dê zanibin ku min derew kiriye.

VALÉRE

Tu jî çî kawik î, te negot doktor bi tiştekî zanin. Heydê zû, kîjan nexweşiyê tu dixwazî bi wê bikeve, ew ê jî hezar qulpî ji nexweşiya te re bibînin.

HARPAGON

(Ji dûr ve, xwebixwe dibêje)

Mala Xwedê ava, kesek tunebû.

VALÉRE

Di encamê de me nêrî ku nebû, em ê jî birevin, biçin ciyekî ku kesek me nebîne; helbet, Élisabeth delal, ku tu biqende bixwazî bi min re bêtî ji min hez dikî...

(Harpagon dibîne)

Erê, divê keç rêz û hirmeta bavê xwe bigre. Navê ku li bejn û bala mêr binêre, tew ku sebebeke weke bêcihêziyê jî li navê hebe, divê bêmunaqeşe çî jê re bê gotin wê bike.

HARPAGON

Her bijî. Peyva rast, kes nikare bêje xerab e.

VALÉRE

Mîrza, ku ez hinekî zêde çûbim û min gotinên zêdeyî hedê xwe ji keça te re gotibin, li min bibore.

HARPAGON

Tu çî dibêjî? Te bi van peyvên xwe dilê min hînik kir, him ez dixwazim ku ew êdî di bin emrê te de be. Erê, heta tu karî bireve. Ez hemû mafê xwe yê li ser te ku Xwedê daye min didim wî û ez dixwazim ku ew çî bêje tu weke wî bikî te fêm kir.

VALÉRE

Bavê te ev heq daye min, êdî ez nebînim ku tu xetê şaş bikî. Mîrza, ji bo ku şîretên min lê kirine bidomînim, ez ê jê venebim.

HARPAGON

Erê, erê, dev jê bernede. Bêşik...

VALÉRE

Ku ez hinekî lixavê lê bişidînim dê ne xirab be.

HARPAGON

Rast e, xebera te ye. Divê...

VALÉRE

Tu qet xwe aciz neke. Qet şika min tune ye ku ez ê ji heqî wê dernekevim.

HARPAGON

Tu çawa dikî tu serbest î. Ez ê jî biçim sûkê hinek karê min he-ye, ez ê niha bêm.

VALÉRE

Erê, li vê dinyayê tiştekî ji pereyan biqîmetir tune ye, divê tu hezar carî bêjî mala Xwdê ava ku bavekî min ê wiha bi rûmet he-ye. Jiyan çi ye ne çi ye, ew dizane. Gava ku hinek keçekê bêcihêz bixwazin, divê mirov li pêş û paş nenêre. Mana jiyanê di vê peyvê de veşartiyê, bêcihêz; ciyê bedewtiyê, ciwantiyê, esîltiyê, şeref û rûmetê, ciyê aqil û راستiyê... yê hertiştî digre.

HARPAGON

Ax! Te dilê min rihet kir, tu çavê min î! Halê mirovê zane cihê ye. Helal be ji wî kesê ku mirovekî wiha di xizmeta wî de be!

PERDEYA DUDUYAN

Sehneya Yekem
(*Cléante, Le Flèche*)

CLÉANTE

Weylê bênamûsî, tu bi ku de cehemiyî, çûyî? Min ji te re çi gotibû...

LA FLÉCHE

Ez çi zanim, Mîrza, ez li vir li benda te bûm, bi derekê de neçûbûm; Lê Mîrzayê bavê te yê bênamele, ez qewirandim, min dikira bigota ku te ji min re gotiye li vir be, lê dê wî wextî li min xista.

CLÉANTE

Karê me çawa diçe? Niha bêtir rê li me teng bû; bîstika din ha-ya min jê çê bû, tu nabêjî bavê min bûye reqîbê min.

LA FLÉCHE

Bavê te jî aşiq bûye?

CLÉANTE

Erê, min kir nekir min nikaribû ku ez jê veşêrim bê çendî madê min ji vê xeberê lihev ket.

LA FLÉCHE

Ew li ku hezkirin li ku! Qey aqilê xwe berdaye? Nexwe hene-

kê xwe bi mirovan dike? Qey di dûvik re kat daye, yê wek wî çima evîndar bibin?

CLÉANTE

Ev ji me kêm bû, jixwe derdê me ne bes bû îcar dora evîna wî ye.

LA FLÉCHE

Tu çima jê vedişêrî ku tu ji keçikê hez dikî?

CLÉANTE

Ji bo ku zêde nekeve şikê da ku bihêsanî em karibin rê li vê zewacê bigrin. Çi bersiva te dan?

LA FLÉCHE

Weleh! Mîrza, xwezî ne bi halê yê ku deyn bike; mirovekî wek te, ku carekê kete nav destê selexweran divê hertiştî bide ber çavê xwe.

CLÉANTE

Nexwe dîsa karê me rast neçû?

LA FLÉCHE

Bibore. Hoste Simonê me, yê ku ji me re gotin biçin cem wî, simsarê karbidest û xîretkêş got, ku ji bo te memnûn bike tiştê ji destê wî tê dike û sond dixwe dibêje sirf ji bo xatirê bejn û bala te be jî, tiştê ku ji destê wî bê ew ê teksîr neke.

CLÉANTE

Ew ê pazde hezar frankê ku min jê xwestiye bide?

LA FLÉCHE

Erê; lê bi hin şertên biçûk, dibêje ku tu bixwazî karê te here serî, divê tu van şertan bi cih bînî.

CLÉANTE

Wî te bi mirovê ku dê peran bide re da naskirin?

LA FLÉCHE

Ax! Bi rastî jî; mesele ne weke ku tu dizanî ye. Ew ji te pê ve naxwaze xwe rê kesî din bide, tu nizanî ku ev yek divê çendî bi awayekî nehînî pêk bê. Heta navê wî jî kes naxwaze eşkere bike, ne li mala wî li maleke din, îro dê we bînin cem hev, dibêjin ku malûmatên di derbarê dewlemendî û malbata te de, ew dixwaze ji devê te bibîhîze; ez dibêjim qet şik û şibhe tê de tune ye, bitenê navê bavê te dikare karê te hêsan bike.

CLÉANTE

Him bermayê rehmetiya diya me jî heye, helbet kes nikare min jê bêpar bihêle.

LA FLÉCHE

Ev çend şertên ku wî bixwe, bi navberkarê me dane nivîsandin da ku berî destpêka kar, divê ez nîşanî te bidim: Kesê ku bi deyn peran dide, bi şertê ku bawer bike dê perên wî bigiş-tî li ciyekî ewle bin; deyndar divê reşît be, her wiha jî divê serweta wî pir be û bi şertê ku ji malbateke ji her şik û şibhê dûr, ewle be dê li hizûra noterê senedeke tam û bêkêmanî ya deyn bê amadekirin; amadekirina senedeke rêk û pêk ji ber ku hîn bêtir divê li berjevendiya kesê ku deyn dide be, divê noter kesekî ku mirov pê ewle be û ji aliyê wî ê ku deyn dide ve bê hîlbijartin."

CLÉANTE

Peyva rast, rast e, mirov dikare çî bêje.

LA FLÉCHE

Ji bo ku tu serêşî ji kesê ku deyn dide re çênebe, perê xwe ji hêjdeyan yekî kêmtir nade deyndar.

CLÉANTE

Ji hêjdeyan yek? Xwedê mirov ji kesên wiha biparêze! Ev e, mirovê birûmet. Helbet niha ne wexta ku mirov dilê xwe bixwe bişewitîne.

LA FLÉCHE

Mixabin wiha ye. Lê ji ber ku perê tê xwestin, ew jî li ber destê kesê ku wê bi deyn bide tune ye û bitenê ji bo ku dixwaze alîkariya deyndar bike vî pereyî ew jî ji yekî din, ji pêncan yek biselef deyn dike, divê deyndar vê selefê jî bide ser xwe, ji ber ku ew sirf ji bo alîkariya deyndar bike vî deynî dike.

CLÉANTE

Wer nebêje! Tu ji xwe re li vî Cihûyî, li vî Erebi? Ev ji çaran yekê jî bêtir dike.

LA FLÉCHE

Gotina te ye; wek ku min jî berî got. Êdî divê tu ji xwe re li taliya vî karî bifikirî.

CLÉANTE

Ez ê li çi bifikirim? Lazimiya min ji vî pereyî heye; ji xeynî ku ez bi ya wan bikim pê ve çareyeke din ji min re nemaye.

LA FLÉCHE

Min jî ev bersiv da wan.

CLÉANTE

Ma hîn tiştekî din jî heye?

LA FLÉCHE

Madeyekî biçûk î din. Ji pazde hezar frankê ku tê xwestin, yê ku bi deyn dide bitenê dikare duwazde hezar banknotî bide, ji bedêla sê hezarên mayî ve jî deyndar divê cil û berg, eşyayên

* Ev biwêj bi wateya kesê çikûs, serhişk û xedar bikar tê.

biqîmet ên bikarhatî ku listeya wan li jêr hatiye diyarkirin bistîne, kesê navborî yê ku bi deyn dide heta ku ji destê wî hatiye bihayekî erzan ji bo van alavan diyar kiriye.

CLÉANTE

Îcar ev çi bû?

LA FLÉCHE

Guhdariya listeyê bike. Beriya hertiştî, textekî çarpê yê razanê ku çûxê wî yê zeytûnî bi şiritên Macarî hatiye xemilandin, li gel şeş rûniştekan ji heman qumaşî ku hemû jî bi rûberên taftayî yên ku rengê wan sor û şîn dibe ne. Wekî din, gulikên hevrişimî yên ji şeyaxê Aumaleyî ji rengê gulên hişk ku pir xweşik in û perdeyên biguhik ên textê razanê.

CLÉANTE

Ez ê çi bikim ji wan?

LA FLÉCHE

Raweste. Wekî din, xaliyeke dîwaran ku wêneyê pevşabûna Gambaut û Macéeyê li ser e.* Di ser re, maseyeke mezin a ji darê gûza li ser duwazdeh nig û destekan e, ku bi tornê hatiye çekirin û mirov bi herdu seriyên wê digre û vedike, li gel şeş rûniştekan wê yên bêkevî.

CLÉANTE

Hela hela, ev dê bikêrî min û çi bên...?

LA FLÉCHE

Hinekî sebir bike. Wekî din, sê tivingên mezin ên biftîl ku hemû jî bisedef û duran xemilandî ne, li gel sê nigên wan ên biçetel. Bi ser de jî, firineke qehweyî, li gel du karnî û sê firaqên

* Ev xalî taximekî ji heşt wêneyên cihê yên serpêhatî û rewşên cihê yên Gambaut nîşan didin pêk tê, ku jê taximekî baş û temam, pir biha ye. Li gor pisporan, ev xalî ji ber ku parçeyêke divê kevn û bêtêr be.

wê ku dê pirî bikêrî heweskarê dapalandinê bê.

CLÉANTE

Van ez ji eyar derxistim.

LA FLÉCHE

Bîhna xwe fireh bike. Wekî din, rebabeke Bolognayî ku têlên wê temam an jî pir nekêm in. Bi ser de jî, textekî lîskê ku bi navê trou-madame** tê binav kirin û yekî dama, li gel taximekî lîska qazê*** yê Yewnanî, ji bo gava karê mirov tunebe mirov pê wexta xwe bi awayekî pir xweş derbas bike. Wekî din, eyarekî tîmsehê, dirêjiya wî sê pê û nîv, tije ka, gava mirov wî bi esrexa jûrekê dake dê tiştêkî pir balkêş be. Ev hemû tiştên ku li jor hatin jimartin, bi rihetî çarhezar û pêncsed lîreyî derbas dikin, lê ji ber ku kesê bideyn dide bînsaf e, bihayê van tiştan hemûyan dadixe sê hezaran.

CLÉANTE

Ne ew be ne însafa wî be, însafa wî bînamûsî bixwe serê wî, çavbirçiyê lewîfî! Kesî heta niha selexwerê wiha diye? Ew fayiza ku bêşerm û bîfedî dixwaze ne bes e, îcar dixwaze pertel û kevnîkên ku ji vî alî wî alî berhevîkirine jî bi sêhezar lîreyî bixe stuyê min. Min dused banknot jî di wan nedida, lê ez çî bikim îro ew çî bêje divê ez wek wî bikim, jixwe ew jî dizane ku ew çî bêje divê ez wek wî bikim, bînamûs destê xwe xistiye qirika min, ma ez dikarim xwe tev bidim?

LA FLÉCHE

Li dilê xwe negre, Mîrza, ez dibînim ku te jî ji bo mala xwe bi destê xwe xera bikî daye ser rîya Panurge****, peran bi deyn distînî, biha distînî, erzan didî, angî genimê xwe bişînkayî dixwî, nahêlî ku bistewe.

** Lîskek e, bi xirakên mezin ku divê mirov bixe kortên biçûk ên li ser textekî, tê lîstin.

*** Lîskek e, li ser kaxezeke ku resmê qazê, şêst û sê hucreyên wê hene û bi du zaran tê lîstin.

**** Panurge yek ji qehremanên berhema binavê Pantagruel a çîroknivîsê binav û deng ê Fransî Rabelais e.

CLÉANTE

Ma ez çi xweliyê li serê xwe bikim? Ev e tiştê ku ji ber çikûsiya bêînsaf a bavan bi serê lawan de tê; paşê jî şaş dibin, dibêjin çawa law mirina bavan bixwazin.

LA FLÉCHE

Tu rastiye bixwazî, nekesiya bavê te jî dikare mirovê herî kemlan û giran ê li rûyê dinyayê ji rê derxe. Mala Xwedê ava ku meyla min û xirabkariyê tune; ji nav hevalên xwe yên ku ez dibînim hezar dek û dolabî digerin, ez bi serbilindî karê xwe dibim serî, ez zû bi zû pê li cihê şil nakim; em ji hev re rast bêjin, mendeûriya bavê te, ez ewqas ji eyar derxistime ku, ez carinan ji xwe re dibêjim hemû pereyên wî bidize bila hişê wî bê serê wî; ez dibêjim qey diziya kesên wiha xêr e, ne guneh e.

CLÉANTE

Ka hela ez careke din li vê kaxezê binêrim.

Sehneya Duduyan

(Maître Simon, Harpagon, Cléante, La Flèche)

MAÎTRE SIMON

Erê, Mîrza, xortekî ku jê re pere divê; rê lê teng bûye, jê re ecele pere divê, dê hemû daxwazên te qebûl bike.

HARPAGON

Pir baş e, lê hoste Simon, aya tu bawer dikî ku tu xeter di vî karî de tune? Tu nav, serwet û malbata kesê ku tu li ser navê wî dipeyivî dizanî?

MAÎTRE SIMON

Na, di vî warî de tiştekî sererast ku ez ji te re bêjim tune; he-ma wiha lê rasthatiye ez pê dame naskirin; lê her tiştê ku tu

bixwazî tu yê ji wî bixwe hîn bibî û li gor peyva devê merivê wî, ku tu wî nas bikî tu yê kêfxweş bibî. Tiştê bitenê ku ez dikarim ji te re bêjim, ew e ku malbata wî gelekî dewlemend e, diya wî ji zû de miriye û ku tu bixwazî, ew dikare senedê bide ku havê wî heşt meh di ser re derbas nabin dê bimire.

HARPAGON

Ew jî ne xirab e. Dilovanî mirov mecbûr dike, hoste Simon, gava ji destê mirov bê divê mirov dilê herkesî xweş bike.

MAÎTRE SIMON

Rast e, gotina te ye.

LA FLÉCHE

Ev ji ku derket? Hoste Simonê me, bi bavê te re dipeyive.

CLÉANTE

Nexwê ew agahdar kirine ku ez kî me? Xwedê bike te jê re gotiye?

MAÎTRE SIMON

Wey! Tu ji ku derketî! Kê ji te re got were vir? Bawer bike, Mîrza, min ne ji wan re navê te gotiye û ne jî mala te nîşanî wan daye; lê, bi raya min, tu xerabiyek ji vê yekê dernakeve. Peyv ji devê van mirovan dernakeve, Hûn dikarî li vir bi hev re rûnên û li hev bikin.

HARPAGON

Te got çî?

MAÎTRE SIMON

Kesê ku dixwaze pazde hezar lîreyî ji te deyn bike ev Mîrza ye, ku min ji te re berê bahsa wî kiribû.

HARPAGON

Weyla bênamûsî? Yê ku ev bazara heram dikir nexwe tu bûyî?

CLÉANTE

Wey, bavo? Nexwe yê ku vî karê kirêt jî dike tu yî? Hoste Simon ji wir difizlikêne diçe.

HARPAGON

Yê ku bi van şertên giran peran deyn dike û dixwaze mala min xirab bike tu yî ne?

CLÉANTE

Yê ku bi selefêke bêwijdan dixwaze dewlemend bibe jî tu yî ne?

HARPAGON

Piştî vê yekê jî, tu şerm nakî tu derdikevî hemberî min!

CLÉANTE

Piştî vê bûyerê tu yê çawa derkevî nav xelk û alemê?

HARPAGON

Ji min re bêje, te şerm nekir ku te xwe xiste rewşeke wiha? Tu van mesrefên bitrî betal dikî? Bêşerm û bêfedî serweta dê û bavên xwe ya ku bi xwêdana eniya xwe dane serhev belawela dikî?

CLÉANTE

Lê tu, tu liberxwe nakevî ku navê te bi selexwerî û delewêrên wiha derkeve? Ji vê çavsoniya xwe ya ku ji serhevdana qurûşan têr nabe, rûmet û namûsê dide bi filûsê, hunerên herî kirêt ên selexwerên herî navdar li pey xwe dihêlî jî fedî nakî?

HARPAGON

Ji ber çavê min biqîşte, bênamûs! Dûr here bila çavê min bi te nekeve!

CLÉANTE

Bêje sûtê kê ji me giran e, bi raya te, yan yên wek min ku ji bo lazimiya xwe pereyan deyn dikin, yan jî yên wek te ku ji çavneharî diziya xelkê dikin

?

HARPAGON

Min ji te re got biceheme, serê min nêşîne.

(Gava bitenê dimîne)

Baş bû ku wiha bû, diz û xwediyê malê bihev hesiyan; êdî çavê min vebû, ji niha û pê ve dê çavê min li ser her hal û hereketa wî be.

Sehneya Sisiyan
(*Frosine, Harpagon*)

FROSINE

Mîrza...

HARPAGON

Raweste hinekî; ez dikim bêm bi te re xeberbidim.

(Ji xwe re dibêje.)

Divê ez herim binêrim bê hîn pereyên min li cihê xwe ne.

Sehneya Çaran
(*La Flèche, Frosine*)

LA FLÉCHE

Kenê guran bi vî îş û karî tê. Divê li derekê embareke wî ya mezin a alavan hebe; ji ber ku me tu tiştêkî di wê lîstê de nas

nekir.

FROSINE

Wî! Ev tu bûyî, La Flèche? Tu ji me re ji ku derketî wiha?

LA FLÉCHE

Wey, tu û van deran Frosin, tu li van deran li çi digerî?

FROSINE

Dê çi bibe, karê ku ez hergav dikim; ez di navbera xelkê de diçim û tîm, karê wan dikim, ev ji destê min tê, te dît ez jî Xwedê çi da ez li fêda xwe dinêrim. Tu dizanî li vê dinyê di-vê mirov îşê xwe zanibe, Xwedê ji qurnazî û çavekîrîbûnê pê ve tu hebûneke din nedaye yên weke me.

LA FLÉCHE

Gelo kar marekî te bi xwediyê malê heye?

FROSINE

Erê, hin kar marên hûrik ez ji bo wî dikim, belkî em çend qurûş pere jê biçîrpînin.

LA FLÉCHE

Tu dikarî jê biçîrpînî? Li ser bextê min ku tu karibî qurûşekî jî jê çê bikî tu jîr î. Ez va ji te re dibêjim, kes bi wî û mecîdiyekî jî mirad nabe.

FROSINE

Hin kar hene ku mirov mecbûr dikin.

LA FLÉCHE

Tu senyor Harpagon nas nakî, ez xulamê te me. Senyor Harpagon mirovekî wiha ye ku tu tîkiliya wî û mirovayetiye bi hev tune, ji nav hemû benderihan, ew yê herî dilkevir û nekese. Tu kar û xizmet nikarin destê wî yê girtî vekin. Heta tu bixwazî jê re peyvên xweş bike, serê wî germ bike, li ber

bigere û bahsa dostaniyê bike, ne li ser guhekî wî ye; lê jê re bahsa pereyan qet neke, tu nikarî tiştekî têxî serê wî. Hete tu karî qencyê pê bike û dilê wî xweş bike qurûş ji destê wî dernakeve û ji peyva danê jî ewqas ditirse, ku qet nabêje; min silav da we, lê dibêje; min silava we girt.

FROSINE

Tu li karê her xwe binêre! Ez dizanim ku ez ê çawa mirovan bînim ser rê; tu sira ku mirov çawa dikare xwe bi wan bide hezkirin, dilê wan xweş bike, çawa hisî dibin ji min bipirse.

LA FLÉCHE

Tiştê ku tu dibêji li vir pere nake. Ku te mirovê me ji aliyê pereyan ve nerm kir, ez ê pîvazekê bi guhê xwe vekim. Him weke tirkekî bêid-rak e, him jî tirkekî wiha ye ku kesek nikare jê tu hêviyê bike; tu li her çavê wî himnî, ava zer ji devê te here ew xwe tevnade. Kurt kur-mancî, ew ji pereyan ji nav û deng, ji rûmet û heysiyetê bêtir hez dike û gava ku kesek jê hideyn pereyan bixwaze ziravê wî diqete. Dawa ruhê wî bike, lê dawa peran lê neke, ku tu pereyan jê bixwazî weke tu nav û dilê wî biqelêşî, kezeba wî derxî; ger... Heyhat dîsa hat; divê ez ji xwe re bi dereke din de herim.

Sehneya Pêncan
(*Harpagon, Frosine*)

HARPAGON

(*Di ber xwe de dibêje*)

Her tişt li rê ye.

(*Dengê xwe bilind dike.*)

Hê hê baş e! Çi heye çi tune, Frosine?

FROSINE

Wî! Helaçê! Wa ye tu baş î! Îro nûr ji wechê te dibare, ez bi Xweda-

yê xwe kim!

HARPAGON

Kî, ez?

FROSINE

Mî tu caran tu wiha rûgeş û dilşad nedîtûbûyî.

HARPAGON

Tu ji dilê rast dibêjî?

FROSINE

Tu ji xwe re çi dibêjî? Ez dibêjim tu di jiyana xwe de wiha ciwan nebûyî; min gelek mirovên bîst û pênc salî ku ji te hîn pîrtir in dîtine.

HARPAGON

Lê mixabin, Frosine, niha temenê min dike bibe şêst salî.

FROSINE

Dê çi bibe? Îcar ku bû şêst dê çi bibe? Ev jî gotin e! Jixwe ev çax tam wextê gulvedana temenê mirov e, û werzê herî xweş ê temenê mêran, ji niha û pê ve dest pê dike.

HARPAGON

Rast e; lê dîsa jî, te dît ku ji temenê min bîst sal kêm bûbûna, ez dibêm qey dê ne xerab bûna.

FROSINE

Tu henekê xwe dikî? Pêdiviya te bi tiştêkî wiha tune ye, hesinê te saxlem e, tu dê bi rihetî sed salî bikî.

HARPAGON

Tu bawer dikî!

FROSINE

Helbet. Ji rewş û tevgera te xuya ye. Ka hela xwe wiha hinekî rast

bike. Oho! Ev e tam ji vir, ji vê qermûçeka navbera herdû birûyên te xuya ye, ku temenê te dirêj e!

HARPAGON

Tu ji tiştên wiha jî fêr dikî?

FROSINE

Bêşik. Ka destê xwe bide min. Tu Xwedê! Tu dibînî ku xeta temenê te çendî dirêj e!

HARPAGON

Çawa?

FROSINE

Tu nabînî ku ev xet dere heta ku?

HARPAGON

De baş e! ev nişana çi ye?

FROSINE

Tu ji xwe re li îşê Xwedê binêre! Min got sed sal, lê tu yê sed û bîstî jî derbas bikî.

HARPAGON

Ev mimkun e?

FROSINE

Ku hinek tiştêkî bi te nekin, ez dibêjim; tu yê him zarokên xwe, him jî zarokên zarokên xwe bi destê xwe veşêrî.

HARPAGON

Pir baş e. Karê me çawa diçe?

FROSINE

Ma divê tu bipirî? Karê ku ez xwe pê bikim û neçe serî heye? He-

la ji bo zewacê ez deriyê mirada me. Li vê dinyayê tu kê bixwazî, heta tu bêjî bîst, ez ê riya ku wan bighênim hev û bikim cot bibînim û ez hawer dikim ku ez bixim serê xwe, ez dikarim Padîşahê Tirk û Komara Venedîkê jî bigihênim hev. Bêgûman karê me ne ewqas zor bû. Ji ber ku ez tim diçim mala wan û tîm min bidirêjayî bahsa te ji hêrduyan re jî kir. min ji diya wê re got, ku te keçik gava li ber pencerê ji xwe re li derve dinêre, carekê du caran dîtîye û tu dixwazî pê re bizewicî.

HARPAGON

Çi bersiv da?

FROSINE

Kêfa wê ji pêşniyaza min re hat; gava min got ku tu pir dixwazî Mariane îşev bê daweta keça te, ew wê gavê razî bû û got tu dikarî bê-yî min jî wê bibî.

HARPAGON

Frosine, ez mecbûr mam ku îşey senyor Anselme dawetî şîvê bikim û ku Mariane jî bê bi me re şîvê bixwe ez ê pir kêfxweş bibim.

FROSINE

Xebera te ye. Piştî fravînê divê bê seredana keça te, ji vir jî hesabê xwe û çûna ji bo ku biçe hinekî li fuarê bigere kiriye, ji wir jî bila bê şîvê bixwe.

HARPAGON

De baş e! Ez ê erebeya xwe bidim wan, bila bi hev re bi ereba min biçin.

FROSINE

Dê pir baş bibe.

HARPAGON

Belê, Frosine, tu bi diya wê re peyiviyî, ew dê weke cihêz karibe çî bi-

de keça xwe? Te jê re bigota divê tu hinekî pê re alîkar bî, hinekî xîret hikî û tiştê ji destê te hê hikî, ji her ku "Hesp hergav bi tûrê vala neyê dest." Vî zemanî kesek bi keçeke ku tiştêkî wê tunebe re nazewice.

FROSINE

Tu çi dibêji? Keçik dê ji te re weke cihêz duwazde hezar lîre bê-ne.

HARPAGON

Duwazde hezar lîre cihêz!

FROSINE

Erê, bi ser de jî, qet ne bi ser zikê xwe de ye; keçik hîn bûye ji seletê, şîr, penîr û sêvan pê ve tiştêkî din naxwe, welhasil ew ne ji wan jinên ku sifra tije bixwaze, ne tiştên bitam, ne nanê genimî, ne jî şêrîniyê bixwe ye; ev jî wiha ne tiştêkî hindik e, her salê, bikêmanî sê hezar tesserûf dike. Ji xeynî vê çavê wê ne li xeml û xêzê ye jî, tiştên pir sade lixwe dike, çavê wê di cilûbergên xweşik, micewherên pir, ne jî li mobilyayên giran e, ku kesên din bi ser wan de dîn dibin; ev jî bi kêmanî dê salê çar hezar lîre fêdê bigihîne te. Bi ser de jî, ji lîska qumarê nefret dike, yên weke wê di nav jinên îroyîn de pir kêm peyde dibin; ez yekê ji taxa me nas dikim ku salê sîh çil hezar jê diçe, îsal bîst hezar frankê wê jê birin. Îcar em bi tenê çarîka vî pereyî hesab bikin. Salê pênc hezarê lîskê, çar hezar cil û zêr, ev dike neh hezar lîre; ku tu sê hezarê xwarin û vexwarinê jî bixî ser, ev e ji te re nake duwazde hezar frankê qutîgrover ê jimartî?

HARPAGON

Erê, ev yek nexerab e; lê ji vî pereyî dê çi bigihîje ber destê min.

FROSINE

Bibore. Te got tiştêk nagihîje destê min, ji te re weke cihêz qenatkerîyeke mezin, bermayekî azweriya sadetîya xeml û xêzê û xezîneyeke wek nefreta ji qumarê têne, ev hemû hindik in?

HARPAGON

Tu henekên xwe bi min dikî? Tu dikî mesrefên ku dê keçik neke weke cihêz di stuyê min rakî? Ji bo tiştê ku ez nestînim ez nika-rim meqbûzê bibirim; divê tiştek bigihîje min.

FROSINE

Xeman nexwe, dê gelek tişt bigihîjin te; ji min re gotibûn, min ji bîra kir, nizanîm li kîjan welatî mal û milkên wan hene, dê hemû ji te re bimênin.

HARPAGON

De ka hela em binêrin bê çi ye. Belê, Frosine, tiştêkî din ê ku ez jê bitasewas im heye. Weke tu jî dizanî, keçik ciwan e û kesên ciwan hertim ji tayên xwe pê ve ji kesekî din hez nakin, ji heval-tiya wan pê ve li tiştêkî din nagerin. Ez ditirsim ku mirovekî we-ke min, bi vî temenê xwe ne li gorî dilê wê be û ev jî di nav ma-lê de dikare bibe sedema hin nerihetiyên ku ev jî bi min nekeve.

FROSINE

Ax! Xwezî te ew baş nas bikira! Min ê hîn ev xuya wê ji te re bi-gota. Ji kesên ciwan û xort bi awayekî nedîtî nefret dike û bite-nê ji kesên navsere hez dike.

HARPAGON

Ew?

FROSINE

Erê, ew. Min dixwest ku dengê wê bihata guhê te bê çi digot. Ew naxwaze ku çavê wê jî bi mirovekî xort bikeve; lê wê bi devê xwe got, gava ku ez navsereyekî bedew bi rîh û simbêlên esîlza-deyan dibînim ez heyran û hişmetkarim lê binêrim. Kesên herî navsere, li ber dilê wê yên herî şêrîntir in, bila haya te jê hebe, tu xwe ji temenê xwe biçûktir nîşan nedî. Ew dibêje mêrê ku ez pê re bizewicim, divê bikêmanî şêst salî be; hîn çar mehên wê

nehûne, tam dema ku dike bizewice, dinêre ku hezkiriyê wê hîn pêncî û şeş salî ye û ji bo peymanê mahrê înzê bike berçavikê nade ber çavê xwe, ji bo wê nîşanê xera dike, dev ji mêrik berdide û pê re nazewice.

HARPAGON

Bi tenê ji bo vê yekê?

FROSINE

Erê. Ew dibêje ku pêncî û şeş salî ji bo min têr nake; û bi taybetî jî bi ser kesê ku berçavka wan li serê difna wan e de dimre.

HARPAGON

Bi rastî jî, cara ewil ez ji te dibihîzim tiştekî wiha.

FROSINE

Ez nema zanim ku êdî ez ê ji te re çawa bêjim. Li jûra wê hin tablo û hin wêneyên çapê hene; tu dibêjî ev teswîrên kê ne? Gelo ne yên ciwanên wek; Adonis, Cephale, Paris û Apollonan bin.* Nexêr: Dibe ku portreyên bedew ên pîrên wek; Saturne, qiral Priam, kalê Nestor û Anchise li ser milên lawê xwe diçû bin.**

HARPAGON

Ev pir baş e! Tiştekî wiha qet nehatibû bîra min û ez gelekî kêfxweş bûm ku haya min ji vê yekê çêbû. Tu rastiye bixwazî, ku ez jî jin bûma min li rûyê mîrên ciwan nedinêrî.

FROSINE

Helbet, gotina te ye. Mirova ku hişê wê hebe li rûçikê xortan dinêre tucarî! Wan sakûlên ku hîn bihna şîr ji devê wan tê, mirov çar-

* Xortên bedew ên mîtolojiyê: Adonis, evîndarê Venusê ye; Cephale, evîndarê Aurora'yê ye; Paris, Helene revandiyê; Apollon jî her wiha bi bedewiya xwe hatiye naskirin.

** Pîrên mîtolojiyê: Saturne, bavê Jupiter e, herdem kal hatiye nîşandan; Priam, qiralê rêzdar ê Troiye; zana Nestor û Anchiseyê ku dema Troia dişewite Enee wî li kolinka xwe dike direvêne. Qenciya te jibîra nekim.

wa dikare ji wan hez bike; ez nizanim xelk çi tamê ji wan digirin.

HARPAGON

Tu ji min bipirsî min jî heta niha tiştêk ji wan fêm nekiriye û ez nizanim çima hin jin hene ku ewqas ji wan hez dikin.

FROSINE

Divê mirov hişê xwe beradabe. Mirov ji xortan hez bike! Tiştê wiha tucarî dibe? Ma dibe ku mirov wan gîskên hîtîk bixe şûna zîlaman? Mirov dikare piştî xwe bi wan serseriyên dera han bibeste?

HARPAGON

Hîngî ez dibêjim zimanê min reş bû. Bi wê bedena xwe ya sorî-sermitî û bi wan sê tayên simbêlên xwe yên wek yê pisîkan, perûkên wan ên gijikî, derpiyên wan ên di nav nigên wan de û paxîlê wan a vekirî heta ser zikê wan kî dikare li mirûzê wan binêre.

FROSINE

Êê! Ji ber yên wek te ve, kesek li rûyê wan dinêre! Mêr haram bin di ser pozê yên wek te re. Mirov heyran e, ku tim li bejna te binêre; qalib û qiyafetê mêran ku ne wiha bin mirov tu carî ji wan hez nake.

HARPAGON

Tu min çawa dibînî?

FROSINE

Tu ji xwe re çi dibêji gidî? Mirov heyranê bejna te ye û mirov dibêje qey serçavên te Xwedê tu ji xwe re bi qelemê çêkiriye. Ka hela wiha hinekî bizîvire, ji kerema xwe re. Ji vî qeysî çêtir jî nabe. Hinekî jî bimeşe ez te bibînim. Ev e weke şêran, bejn û bala lihevhatî ya mêran, ji nezera çavan dûr be, kes dikare kêmasiyê jê re bibîne an îletê têxê?

HARPAGON

Mala Xwedê ava, tu nexweşî û ileteke min a mezin tune. Ji kuxika min a ku yek caran bi min digire pê ve tişteki min ê din tune.

FROSINE

Tiştêk nabe. Kuxika te jî ne xerab e, bi te dikeve û tu pir bi kubarî dikuxî.

HARPAGON

De ka hinekî ji min re bêje: Marianê hete niha ez nedîtîme gelo? Aya gava ez di her deriyê mala wan re çûme-hatime ez nedîtîme tu caran?

FROSINE

Na, nedîtîye; lê me bidûr û dirêjî bahsa te kir. Min jê re ta bi derziyê vekir; min meziyetên te yeko yeko jê re gotin û her wiha bi ser ve jî zêde kir ku qismetekî weke te careke din bi destê wê nakeve.

HARPAGON

Te qenc û xweş kiriye, ez sipasiya te dikim.

FROSINE

Mîrza, ricayeke min a biçûk ji te heye.

(Harpagon madê xwe tirş dike.)

Mahkemeyeke min heye ku ez xercê wê, ne tişteki pir e, nedim, ez ê ceza bixwim; ku tu rahma xwe ji ser min kêmkî ez ê bi hêsanî jê xelas bim... Tu nizanî ku gava keçik te bibîne dê çendî şad û bextewer bibe.

(Dîsa kêfa wî tê cîh.)

Ax! Dê çendî ji te hez bike! Tew ew ê bi ser vê bestika te ya entîke ku te lê qulaptîye de din bibe! Lê ji her tiştî bêtir jî ew ê bi ser vî şalê te yê kin, ku te ew bi kordonan bi saqoyê xwe ve girêdaye de velîze, ew ê ji bo te hişê xwe berde; gava ku evîndarekî wek te salê wî bi qordon bibîne dikare xwe bigre?

HARPAGON

Bêgûman, te bi van peyvên xwe dilê min hînik kir.

FROSINE

Bi rastî jî, Mîrza, encama vê daweyê ji bo min heta ku tu bixwazî girîng e.

(Harpagon dîsa mirûzê xwe tirş dike.)

Ez ê perîşan bihim, ku ez wê wînda bikim; tevî ku bi hin alîkariyên biçûk ez dikarim îşê xwe rast bikim... Xwezî te ew bidîta gava min jê re bahsa te dikir çendî kêfxweş dibû.

(Harpagon dîsa nerm dibe.)

Gava min jê re meziyetên te ravedikirin çavên wê diburûsîn û min wî ha lê kir ku ji bo ev zewac rojek berî rojekê pêk bê nema sebir bike.

HARPAGON

Te ez gelekî kêfxweş kirim, Frosine; ez deyndarê te me, bawer bike, ez tu carî nikarim vê qanciya te li te vegerînim.

FROSINE

Ez ketim bextê te û Xwedê, Mîrza, tu yê vê alîkariya biçûk a ku ez ji te dixwazim bi min re bikî,

(Harpagon mirûzê xwe tirş dike.)

Weke ku tu hemû malê dinyayê bidî min, heta ku ez hehim ez ê vê qanciya te ji bîr nekim.

HARPAGON

Bi xatîrê te, hin nameyên ku divê ez ji bo karê xwe binivîsim hene, divê ez herim wan binivîsim.

FROSINE

Baweriya te ji Xwedê hebe, Mîrza, hergî tu nikarî qanciyeke ji vê mezintir bi min bikî.

HARPAGON

Ez ê tembiyê bidim wan, bila erebeya min amade bikin ku hûn pê herin bazarê.

FROSINE

Min tu ewqas aciz nedikirî, ku ez gelekî ne mecbûr bûma.

HARPAGON

Ez ê bêjim bila şîvê jî zû amade bikin, ji bo gava hûn zêde bixwin pê dereke we neêşe.

FROSINE

Min tiştê ku ji te xwestiye mahrûm neke, ez ricayê ji te dikim. Ax, ku te zanibûya te qenciyeke çawa bi min dikir...!

HARPAGON

Ez diçim. Vaye gazî min dikin. Heta em careke din hev dibînin, niha bi xatirê te.

FROSINE

Maşalê tu di agirê cehniemê de bişewitî, kûçikê ji nêza mirî, de here bê situyê te naşikê! Nekesê kotî rê li ber her daxwaza min girt; tişteke nabe aliyê din heye, ez bawerim ez ê ji wir têra xwe tiştan bistînim.

PERDEYA SISIYAN

Sehneya Yekem

(Harpagon, Clèante, Élise, Valère, Dame Claude, Hoste Jacques, Brindavoine, La Merluche)

HARPAGON

Heydê, hemû werin vir, ez ê karê ku divê hûn bikin li we belav bikim ji bo zûka herkes karê xwe bike. Were vir, Claude xanim. Ez ê ji te dest pê bikim.

(Melkesek di destê jinikê de ye.)

Pir baş e, ev e çeka te di destê te de ye. Tu yê herderê baş paqij bikî, bimalî; lê bila haya te jê hebe, bi taybetî jî mobîlyayan zêde nefirkêne, wan hemet bike da ku zû kevn nebin. Ji xeynî vê, ez karê çavdêriya şûşan jî didim te, heta xwarin xelas bibe divê çavê te li şûşên ser sifrê be; yek winda bibe an jî tiştêk bişkê, ez jî te zanim, ez ê perê wê ji mehaneya te bibirim.

HOSTE JACQUES

Cezayên wiha pir bi kêrî wî tên.

HARPAGON

Heydê. Tu, Brindavoine û tu, La Merluche, ez karê şûştin û tije-kirina piyaleyên şerabê jî didim we, hûn ê vexwarinê belav bikin, lê bi tenê gava ku mêvan tî bûn hûn ê bidin wan, nexwe divê hûn wek hin xulamên ku hedê xwe nizanin nekin, gava ne li ser bala mêvanan be piyaleyên wan tije nekin û ji bo zêde şerabê vexwin wan tahrîk nekin. Li bendî wan bin bila du sê caran ji we

bixwazin, lê tu carî ji bîra nekin avê pirî bînin deynin ber wan.

HOSTE JACQUES

Erê, şeraba bêav zû mirov serxweş dike.

LA MERLUCHE

Em ê berdilkên xwe ji xwe bikin, Mîrza?

HARPAGON

Erê, gava we dît ku mêvan tên li cilên xwe miqate bin bila gema-rî nebin.

BRINDAVOINE

Mîrza, tu dizanî newiha, ku lekeyeke mezin a dohnê lempê li pê-şiya saqoyê min heyê.

LA MERLUCHE

Tu dizanî, Mîrza, yê min jî paşê derpiyê min tevde çiriyaye, pey-va min ji civatê der, hema bêje hertiştê min ji derve ye...

HARPAGON

Hiş be. Bi serinc be, paşê xwe bide dîwêr û berê xwe bide mê-
vanên li ser sifrê.

*(Harpagon, ji bo ku nîşanî Brindavoine bide, bê divê çawa lekeya
dohn a li ser saqoyê xwe veşêre, şewqa xwe dide pêşiya saqoyê
xwe.)*

Tu jî gava xizmetê dikî dive tim şewqa xwe wiha bigrî. Ez ji te re
dibêjim, keça min, divê çavê te jî li xwarina ji ber mêvanan bimî-
ne bê û pariyekî nên jî bi derekê de here ez ji te dizanim. Tiştên
wiha pir bi keçikan dikevin. Lê berî hertiştî jî dive çave te li der-
gistiya min be, ew wê bê seredana te û dive tu pir lê miqate bî.
Paşê hûn ê bi hev re biçin bazarê, tu qebûl dikî?

ÉLISE

Erê, bavo.

HARPAGON

Û tu, lawê min ê nazik, li biçûkan qusûr li mezinan efû, ez rezaleta te ya gava din efû dikim, lê ez nebînim ku tu pê re madê xwe tirş bikî, herê.

CLÉANTE

Ez, bavo, madê xwe tirş bikim? Ji bo çi ez ê madê xwe tirş bikim?

HARPAGON

Hela hela! Dê ji bo çi be, em dizanin ku zarok gava bavê wan ji nû ve dizewice çi dikin û hînbûne bi çi çavî li jimbava xwe ya ku jê re dibêjin dêmarî dinêrin. Lê ger tu bixwazî ku ez lewçetiya te ya gava din jibîra bikim, jibîra neke ku divê heta ji te bê tu bi kekê re biken, bikêf û henek eleqedar bibî.

CLÉANTE

Tu rastiye bixwazî bavo, ji ber ku dê bibe dêmariya min ez nikarim bêjim ku dê kêfa min jê re bê; gava ez wiha bêjim ez ê derewan li te bikim, lê ji bo pêşwaziyeke xweş, pê re bikêf û henkbûnê, ez dikarim di vî warî de soz bidim ku ez ê kêmaniyê nexim tiştê ku ji destê min bê, ez ê hertiştî li gor dilê te bikim.

HARPAGON

Balê li vê yekê miqate be.

CLÉANTE

Tu dibîni ne hewceye ku tu bêjî, ez ê ji te bêtir lê miqate bim.

HARPAGON

Tu yê qenc û xweş bikî. Valère, di vî warî de alikariya min bike. Hê yewel, hoste Jacques, were vir, min tu hiştî dawiyê.

HOSTE JACQUES

Bi ajokerê xwe re, Mîrza, yan jî aşpêjê xwe re dixwazî xeber bidî? Ji ber ku ez him ajoker, him jî aşpêj im.

HARPAGON

Ez ê bi herduyan re jî xeber bidim.

HOSTE JACQUES

Baş e, lê ji herduyan berî bi kijanî re?

HARPAGON

Bi aşpêj re.

HOSTE JACQUES

Wê gavê hinekî raweste, ji kerema xwe re.

(Qapûtê xwe yê ajokeriyê ji nav milên xwe datine, bi berdilka aşpêjiyê xuya dibe.)

HARPAGON

Hela hela, tu ji xwe re li vê seremoniyê binêre?

HOSTE JACQUES

Kerem bike, te dê yê çi bigota.

HARPAGON

Îşev mêvanên min hene, hoste Jacques, min ew dawetî şîvê kirine.

HOSTE JACQUES

Gurek li ku miribû gidi!

HARPAGON

De ka ji min re bêje, tu yê ji me re xwarinên xweş çêbiki?

HOSTE JACQUES

Helbet, tu têra min pereyan bide, wekî din karê te pê tune.

HARPAGON

Ah de werin, rabe rûnê pere! Tu dibêji qey peyveke din ji devê

wan derkeve guneh e: "Pere, pere, pere." Ax ! Tu dibêji qey ji vê peyvê pê ve tiştêkî din nizanin: "Pere." Vir de pere, wê de pere. Ev e benîştê devê wan, pere.

VALÉRE

Min qadirciwabiya wiha li tu derê nedîtiye. Tu dibêji qey bi pereyan pir xwarin çêkirin jî marîfet e, gava ku pere hebin pîrka min jî dikare xwarinên xweş çêbike; lê ez heyrana wî mêrî bim ku bi perê hindik xwarina xweş çêbike.

HOSTE JACQUES

Bi perê hindik xwarina xweş!

VALÉRE

Erê hoste ew e, ku ji tune de çêbike.

HOSTE JACQUES

Welehî, nazir efendî, tu baş dibêji; madem tu van qubedaxiyan dikî û wiha di her girarê de dikelî de ka ji kerema xwe re berdilka min li ber xwe bike, dakeve pixêriyê û vê sirê nîşanî me jî bide.

HARPAGON

Bişemirênin. Ka ji min re bêjin bê çi lazim e.

HOSTE JACQUES

Ev e tu û nazirê xwe, Mîrza, de ka em ê jî bibînin bila ji te re bi pereyên hindik xwarinên xweş çêbike.

HARPAGON

Hê! Ez ji te re dibêjim, bersiva min bide.

HOSTE JACQUES

Mêvan çend kes in?

HARPAGON

Neh deh kes; lê tu heştan bihesibîne; xwarina ji bo heşt kesan dê bi hêsanî têra deh kesan jî bike.

VALÉRE

Têra dehan û zêdetir jî dê bike.

HOSTE JACQUES

De baş e! Wê gavê çar cure xwarinên giran û pêncên sivik dê lazim bin. Şorbe... Selete...

HARPAGON

Weyla mal neketî ! Bi ewqas xwarinê, ez dikarim bajarekî têr bikim.

HOSTE JACQUESE

Goştê qelandî...

HARPAGON

(Destê xwe dibe ber devê xwe)

Weyla teresî! Ji Xwedê bitirse, qey tu dixwazî li ser koka min rûnê.

HOSTE JACQUES

Sewze, meywe...

HARPAGON

Hîn jî?

VALÉRE

Qey niyeta te heye ku tu xelkê hemû biteqênî ? Yan Mîrza ji bo ku tu xelkê bixwarinê bikuji dawet dike? Here hinekî ji xwe re qaideyên noşdariyê hîn bibe, ji bijîşk û hekîman bipirse, bê tîstek ji xwarina pir bizirartir ji bo siheta mirov heye yan na?

HARPAGON

Xebera wî ye, rast dibêje.

VALÉRE

Here ji xwe re hîn bibe, hoste Jacques, divê haya te û yên wek te jê hebe ku ferqa sifreyeke ser tije goştê zêde dênî ber mirov û benekî têxî situyê mirov tuneye; ger tu bixwazî qenciye bi mirovê ku wî dawetî xwarinê dikî bikî, divê xwarinên sivik li ser sifrê pir bin, ne yên bidohn û giran; weke pêşiyên me jî gotine, divê mirov ji bo bijî xwarinê bixwe, ne ku ji bo bixwe bijî.

HARPAGON

Haha! peyva rast kî dikare bêje ne rast e! Hela were ba min, ku ez te maçî bikim ji bo vê peyvê. Min di heyata xwe de peyveke wiha di cîhê xwe de nebihîstibû. Divê mirov ji bo xwarinê bijî, ne ku ji bo bijî bi... Na, ne wiha bû. Te çawa got?

VALÉRE

Divê ku mirov ji bo bijî bixwe, ne ku ji bo xwarinê bijî.

HARPAGON

Erê. Deng hate te? Yê ku ev peyv gotiye çi mirovekî bîaqil bûye. Navê wî çi bû gelo?

VALÉRE

Niha navê wî nayê bîra min.

HARPAGON

Ji bira neke ji min re binivîse. Ez ê li ser tîfika jûra xwe bi herfên zêrînî binivîsim.

VALÉRE

Na na ez ji bîra nakim. Ji bo xwarinê jî, qet mereqan neke, tu wê ji min re bihêle. Çi lazim be ez ê bixwe bikim.

HARPAGON

Bike, teksir neke.

HOSTE JACQUES

Pir baş e: Tu yê min jî ji zehmetiyê xelas bikî.

HARPAGON

Te dit ew xwarinên ku zêde nayên xwarin û gava ku mirov dixwe jî zû zikê mirov bi wan têr dibe divên. Hinik fasûliyên hebî yên bidohn, li gel hin borekên di dizikê de ser wan tije şembelot filan bêvan.

VALÉRE

Tu ji min re bihêle, ez dizanim ez ê çi bikim.

HARPAGON

Ha, hoste Jacques, divê tu jî aniha erebeya min paqij bikî.

HOSTE JACQUES

Raweste hela. Ev karê ajoker e.

(Qapûtê xwe disa li xwe dike.)

Te got...

HARPAGON

Min got erebeya min bişo û hespan jî hazir bike, tu yê zaroyan bi erebeyê bibî bazarê...

HOSTE JACQUES

Hespan, Mîrza? Welehî, heywanên reben ji hal ketine, nikarin gava xwe ji vir û dera han bavêjin. Ez nikarim bêjim ku li ser kayê jî veketine, kaya ku heywanên ker û lal li ser mexel bîn jî tune ye û ku ez bêjim heye jî derew e; te ew xistine parêzeke wiha, ku heywanên reben bûne tertîq, ji hespîtiyê derketine bûne îskelet û mane.

HARPAGON

Helbet dê nexweş bikevin; ji ber ku ji sibê heta êvarî di hundir de ne, tiştekî nakin.

HOSTE JACQUES

Îcar ku betal in, Mîrza, ma bila tiştekî jî nexwin? Ji heywanê reben re çêtir bû, ku pir bixebitiyana û li gor wê jî bixwarana. Her ku ez wan wiha di wî halî de, ji xwe de ketî dibînim dilê min li ser wan têşe; ez ewqas ji hespên xwe hez dikim ku, neheqiya li wan dibe ez dibêjim qey li min dibe; ez her roj ji qirika xwe digirim û êm didim wan û ji bo mirov li ber van benderuhên ker û lal nekeve, Mîrza, divê dilê mirov ji kevir be.

HARPAGON

Çûna ji vir û heta bazarê, bixwe ne ewqas karekî zor e.

HOSTE JACQUES

Na, Mîrza, dilê min dest nade ku ez wan bixim ber erebê, bi ser vî halê wan de, ez nikarim qamçî li wan bixim gunehê wan têxim situyê xwe. Heywanên ku nema karin xwe hilgirin, çawa wijdanê te qebûl dike ku tu wan têxî ber erebeyê?

VALÉRE

Mîrza, ez ê ji cîranê me Picard rica bikim bila bê erebê bajo. Jixwe ji bo em xwarinê hazir bikin jî dê lazimiya me pê hebe.

HOSTE JACQUES

Pir baş e, ji dêvla ku di nav lepê min de bimirin bila di destê hinekên din de bimirin.

VALÉRE

Hoste Jacques pir zimandirêjiyan dike!

HOSTE JACQUES

Mîrza nazir jî difna xwe dixê her tişî.

HARPAGON

Hiş be!

HOSTE JACQUES

Mîrza, ez ji şelafiyên wiha hez nakim û ez dibînim ku ev cehd û kontrola wî ya ji bo nan û şerabê, ji bo êzing, xwê û mûman hemû ji bo ku xwe bi te şêrîn bike û dilê te xweş bike ye. Gava ez vê yekê dibînim hiletê min jê dere û her roj gava ku ez dibînim li paş te jî çi dibêjin ez dikim dîn bibim; tevî ku min gelekî ji destê te kişandiye jî, dîsa dilê min bi ser te de ye; piştî hespên min kesê ku ez herî jê hez dikim tu yî.

HARPAGON

Tu dikarî ji min re bêjî ku di derheqê min de çi dibêjin, hoste Jacques?

HOSTE JACQUES

Erê, Mîrza, ger ku ez zanibim tu yê xwe nexeyidênî ez ê ji te re bêjim.

HARPAGON

Na, çima ez ê xwe bixeyidînim.

HOSTE JACQUES

Li min bibore, ez baş dizanim ku tu yê bixeyidî.

HARPAGON

Ez qet xwe naxeyidînim, herevajîya wê, ez ê kêfxweş bibim, ez dixwazim zanibim bê li paş min ji min re çi dibêjin.

HOSTE JACQUES

Mîrza, piştî ku tu dixwazî, ez ê vekirî bêjim, herkes henekê xwe bi te dike; li her derê di derbarê te de her tiştî dibêjin; tiştê nemayî ji te re dibêjin avayiyê di te de nahêlin, li ser nekesiya te tiştek namîne ku ji te re nahêjin. Yek dibêje ku te salnameyeke bi taybetî çêkiriye, her

çar wextên parêzê û nobet derxistiye du qatan, ji bo ku tu jê istifade bikî ji maliyan mecbûrî parêzê dikî. Yê din dibêje rojên cejnan ji bo ku diyariyan nedî, ji bo ku heqê xulamên xwe yên dev ji kar berdin nedî li benda fersendekêyî ku bi wan re şer bikî. Yekî din dibêje xwedêgiravî ji ber ku piçek goştê bi hestiyekî hêta mîhê ve mabû xwariye, te dawê di derhekê pisîka cîranan de vekiriye. Li gor gotina devê yekî din xwedêgiravî gava tu hatiya ku em ê hespên xwe bidizî, seyisê we yê heriya min te girtiye û di tariyê de nîzanim çend dar li te xistine, te nexwestiye kes bi te bihese û te dengê xwe nekiriye. Welhasil tu hîn dixwazî ku ez bêjim? Ji ber van gotinan mirov nîzane dê bi ku de biçe, ku kesek henekê xwe bi te neke; tu bûyî pêkeniyê xelkê herkes henekên xwe bi te dike û kesek navê te bi qencî hilna-de ji xeynî ku ji te re dibêjin çikûs, nekes, xesis û pintî.

HARPAGON

(Bi dêr lê dixê)

Wey sersem, rezîl, bênamûs, qeşmer.

HOSTE JACQUES

De binêrin ! Ne weke ku min gotibû? Te guhdariya min nekir. Min ji te re negot ku ez rastiye ji te re bêjim tu yê xwe bixeyidîn?

HARPAGON

Hîn bibe ku divê tu çawa xeber bidî.

*Sehneya Dudyuan
(Hoste Jacques, Valère)*

VALÈRE

Hoste Jacques, ez dinêrim ku rastgotiniya te bi kêrî te ne hat.

HOSTE JACQUES

Weyla! Tu ji xwe re li Mîrza nûhatiyê me, ku çawa xwe qure dike, ew

ne karê te ye. Ji dêvla ku tu yê bi min bikenî, raweste kengî ku te dar ji xwe dawêşandin wê gavê hikene.

VALÉRE

Ax! Mirza hoste Jacques, wiha zû xwe mexeyidîne, ez heyrana çavên te me.

HOSTE JACQUES

Wiha di nermikê xwe de dibêje. Tu bisekine ez hinekî xwe li vî bize-mitînim, ku dengê xwe bibe, ez ê hinekî difna wî bifirkînim. Li min binêre, çi hiqehîqa te ye tu dikenî, ma ez bi te re dikenim? Û ku tu zêde serê min biêşînî, ez ê nîşanî te bidim bê ken çawa ye?
(*Hoste Jacques, Valère tehdid dike û wî heta kêleka sahnê dahf dide.*)

VALÉRE

Hê! Hêdî be.

HOSTE JACQUES

Çawa, ez hêdî bim? Te emana min bir.

VALÉRE

Ez ketim bextê te!

HOSTE JACQUES

Terbiya te kême.

VALÉRE

Mirza hoste Jacques...

HOSTE JACQUES

Êdî ez Mirza hoste Jacques moste Jacques nasnakim. Ku ez darekî bigrim destê xwe, ez ê mirina te bînim.

VALÉRE

Çawa, te got dar?

(Vê carê Valère heta hêl te de heye wî dahf dide dibe aliyê din ê sah-nê.)

HOSTE JACQUES

Na, na! Min tişteki wiha negot.

VALÉRE

Tu li hemberî xwe mêran nabînî, bêmêjî? Îcar ku ez darekî bigrim destê xwe tu yê bibînî ku ez çi tînim sere te.

HOSTE JACQUES

Qet şika min tuneze, tu yê bikî.

VALÉRE

Te niha got qey ez jî bûme metehêkî, tu xwarinpêjekî dera hanî berxê min!

HOSTE JACQUES

Ez baş dizanim ku ez kî me.

VALÉRE

Lê xuya ye, tu hîn min nas nakî ku ez kî me.

HOSTE JACQUES

Li min bibore.

VALÉRE

Te got, ez ê mirina te bînim ne?

HOSTE JACQUES

Me jixwe re henek kirin gidi.

VALÉRE

Qet xulqê min li henekên yên wek te tuneze.
(Çend daran datîniyê.)

Berî hîn bibe ku xelk çawa henekan dikin, paşê were bi min re henekan bike.

HOSTE JACQUES

Qeda bi rastgotiniyê keve! Tiştêkî ne baş e, welhasil. Ji niha û pê ve ez nema rast dibêjim, ji xwe ne rastî bi serê min ketiye. Hela efendi-yê me li derî han; belkî hinekî heqê wî heye ku lin min bixê; lê ku ew nazirê wî, careke din bikeve destê min, ez dizanim ku ez ê çi bînim serê wî.

Sehneya Sîstyan

(Frosine, Mariane, Hoste Jacques)

FROSINE

Hoste Jacques, tu zanî, gelo Senyor li mal e?

HOSTE JACQUES

Çawa nizanim, li mal e, li mal.

FROSINE

Bêzehmet, jê re bibêje, ku em li vir li bendî wî ne.

Sehneya Çaran

(Mariane, Frosine)

MARIANE

Ax! Frosine, xweziya te ne bi halê ku ez tê de me! Tu rastiye bixwazî, ez pir ditirsim, gava ez wî bibînim ez nizanim ku ez ê çi bikim!

FROSINE

Lê çima, tiştê ku tu jê ditirsî çi ye?

MARIANE

Heyhat! Ma tu hîn jî dipirsî? Ma tu nikarî texmîn bikî ku gava mirov ji bo mirinê bibin ber sêdarê hiseke çawa ye?

FROSINE

Ez dizanim, ji bo mirineke xweş, Harpagon ne sêdara ku tu dixwazî hemhêz bikî ye û weke ez di dilê te de me, ez dizanim ew xortê kej ku te ji min re behsa wî kiribû disa hatiye bîra te, ne?

MARIANE

Erê weleh, Frosine, ez nikarim ji te veşêrim; piştî ku çend caran hate mala me û çû, ewqas nazik û kubar bû ku, divê ez li xwe mukurbêm, hinekî dilê min ketê.

FROSINE

Ma te tê derxist ku kî bû?

MARIANE

Na, ez qet nizanim ku kî bû; tiştê ku ez dizanim xortekî hêja bû ku mirov jê hez bike; ku bi ya min bûya, min ji wî pê ve kesî din nedikir û divê ez rast bêjim ku tesîra wî jî di vê nefreta ji mêre ku wê min bi zorê bidinê de ne kême.

FROSINE

Ez bi navê Xwedê kim! Ew xortên kejk xweş û baş in, ji heq jî derdikevin, dizanin xwe bi mirov şêrîn bikin; lê piraniya wan birçî ne, ji nêza dimrin, pênc quruşê biqul di berîka wan de tune ye; ya baş ew e, tu mêrekî kal bikî ku mal û milkê wî ji te re bimîne. Tu rastiye bixwazî, li gel vê jî ne ku tamesariyên mêrekî wiha tune ye; lê ev zehmetî zêde najon, dê bimre, baweriya te ji Xwedê be, wê gavê tu yê yekî bi dilê xwe bikî, heyfa kevn û nû tevde hilînî.

MARIANE

Tu û Xwedê! Frosin, ji bo bexteweriya xwe, mirov li benda miri-

na yekî be û mirina wî bixwaze tişteki nedîtî ye, him ecelê xelkê ne bi destê mirov e, kî dizane kî herî kê dimre.

FROSINE

Tu ji xwe re çi dibêji? Tu yê hişertê ku te di demeke nêzîk de bî bihêle pê re hizewicî û divê ev şertek ji şertên bazara we be. Ku di nava sê mehan de nemire divê melûn bibe. Vaye ew bi xwe hat.

MARIANE

Wî! Frosine, madê mirov ji mirûzê wî li hev dikeve!

Sehneya Pêncan
(*Harpagon, Frosine, Mariane*)

HARPAGON

Delala min, ji ber ku ez bi berçavkê hatime te bibînim, qet divê tu li dilê xwe negirî. Ez dizanim, ji bo mirov hedewiya te ya gava nû dibîne çavê mirov li her venabin bibîne ku, ne hewceye ku mirov berçavkê bide ber çavên xwe; lê di encamê de li sitêrkan jî bi dûrbînan dinêrin; him qet şik tê tuneke ku ferqa te û sitêrkan ji hev tuneke, him jî sitêrkek wiha ku ji nava sitêrkan ya herî xweşik î. Frosine, qet bersiva min nade, wiha xwiya ye ku bi dîtina min qet şad nebû.

FROSINE

Ji kêfa hîn bi ser hişê xwe de nehatiye; him keç şerm dîkin ku zû bi zû ya dilê xwe ji mirov re bêjin.

HARPAGON

Gotina te ye. Binêrin, ev e narîna min, keça min hatiye ku silavekê li te bike.

Sehneya Şeşan
(*Élise, Harpagon, Mariane, Frostne*)

MARIANE

Ez ji bo seredaneke wiha, pir dereng mam, sitî.

ÉLISE

Tiştê ku diviya min bikira, te kir, sitî, li min bibore.

HARPAGON

Te dit keça min mezin bûye; beleheq negotine gîhayê zexel zû mezin dibe.

MARIANE

(*Di guhê Frosineyê de*)

Wî! Çi mirovekî cir nexweş e!

HARPAGON

Keça delal çi dibêje?

FROSINE

Dibêje tu mirovekî xwîn şêrîn î.

HARPAGON

Dilxweşkirina te ji bo min rûmeteke pir mezin e, şêrîna min.

MARIANE

(*Xwe bixwe*)

Çi ehmeq e!

HARPAGON

Ez biqurbana wan dev û lêvên şekirîn bim, ku ew peyvên şêrîn jê der dikevin.

MARIANE

(Di ber xwe de)

Ez nema dikarim debar bikim.

HARPAGON

Ev e lawê min jî tê ku rêz û silavên xwe pêşkêş bike.

MARIANE

(Hêdika, di guhê Frosineyê de)

Wax! Frosine, tu ji xwe re li vê ecêbê! Ev xortê ku min ji te re behsa wî fikir bixwe ye.

FROSINE

(Ji Marianeyê re dibêje)

Kîloşik û dartelaqî li hev rast hat.

HARPAGON

Ez dinêrim ji ber ku zarokên min ewqas mezin in tu şaş bûyî, lê pir najo ez ê herduyan jî ji ser serê xwe bikim.

Sehneya Heftan

(Clèante, Harpagon, Élise, Mariane, Frosine)

CLÉANTE

Sitî, tu rastiye bixwazî, ji bo min ev bûyerek e, ku min qet hêvî nedikir; gava bavê min bistika din niyeta xwe ji min re got ez şaş bûm, mat mam.

MARIANE

Min jî dikira heman tişt bigota. Ev hevdiştin bi qendî ku ji bo te surprîz bû, ji bo min jî heman tişt bû.

CLÉANTE

Rast e, Sitî, bavê min terciheke ji vê baştir nikanibû bikira, dîtina te ji bo min rûmeteke mezin bû, ez gelekî kêfxweş bûm; lê tevî wê jî, gava ez difikirim ku tu yê bibî demariya min ez nikarim bêjim ku ez ji bo vê jî kêfxweş im. Divê ez bêjim, devê min nage-re ku ez ji bo vê jî, heman îltifatê bikim; him ev sifateke wiha ye, ku li dilê xwe negre, ez qet layiqê te nabînim. Ev peyvên min bel-kî bi hinekan giran bîn; lê ez bawerim ku tu yê heq bidî min; di-vê tu baş zanibî, Sitî, ku ev zewac qet ne bi dilê min e; ji ber ku tu zanî ez ê bikevim rewşeke çawa, divê tu heq bidî min ku ez çima li dijî wê me; welhasil bi destura bavê min be, ez dixwazim vê jî bêjim, ku ev yek bi destê min bûya, min qet nedihişt ku ev zewac here serî.

HARPAGON

Ev e, ancax mirov karibe ewende bêrêz bibe: Ev jî peyvin ku mi-rov bike!

MARIANE

Him ez jî, ji bo ku bersiva te jî bidim, dibêjim ku ji bo min jî se-dîsed heman tişt mewzûbahs e; çawa ku tu naxwazî min weke dêmariya xwe bibînî, bêgûman ez jî naxwazim te weke lawê he-wiya xwe bibînim. Ez hêvî û ricayê ji te dikim, divê tu bawer ne-kî, ku min dixwest ez tiştêkî wiha bê dilê te bikim. Ger ez tişte-kî ku bê dilê te be bikim, ez ê jî pir pê biqehêrim; ku hêzeke ne-penî min mecbûr neke, ez soz didim te ku hergîz ez ê bi zewa-ceke wiha ku te xemgin bike razî nebim.

HARPAGON

Heqê wê heye; ji bo îltifateke wiha nelirê bersiveke wiha lazîm bû. Ji ber çortiyên lawê xwe, ez dawa lêborînê dikim, delala min. Xort e, naşî ye, nizane ku çi ji devê wî derdikeve.

MARIANE

Bawer bike, ez bi peyvên wî qet neêşiyam; berevajiya wê, ez bi

rastgotiniya wî ya ku hisên xwe rastarast eşkere kirin şad û bextewer hûm. Pir kêfa min hat ku hisên xwe vekirî gotin; ku hisên xwe ji min veşarta min ê jê bawer nekira.

HARPAGON

Tu ji çêyî û qenciya xwe wiha dibêjî, li qusûra wî nenêre. Ji bo hişê wî bê serê wî hinekî wext divê, tu yê bibînî ku ew ê çawa fikr û hisên xwe biguhere.

CLÉANTE

Na, bavo, guhertina hisên min qet ne bi destê min e û bitaybetî ez rica dikim ku Sitî bi vê yekê bawer be.

HARPAGON

Tu ji xwe re li lewçetiyên wî binêre! Ji dêvla ku hiş bibe hîn pê de tê.

CLÉANTE

Qey tu dixwazî ku ez durûtiyan bikim?

HARPAGON

Hîn jî tu dipeyivî? Niyeta te ku tu bişemirînî, ji xwe re bahsa tiştekî din bikî tune ye?

CLÉANTE

Bila wek te be! Madem tu dixwazî ku ez bi awayekî din bipeyivim, Sitî, bi destûra te be, ez ê niha xwe têxim şûna bavê xwe û bi leknê wî bi te re xeber bidim. Divê ez li xwe mikurêm ku li ser rûyê vê dinyayê min kesek di hasn û cemala te de nediye; ez bexteweriyeke mezintir ji bidestxistina hezkirina te pê ve nabînim, payeya bûyîna mêrê te ji bo min serketina herî mezin e, rûmeteke ewqas bilind e ku ez wê bi siûda mîrên herî mezin ên li ser rûyê vê dinyayê naguherim. Erê, Sitî, bexteweriya ku mirov bibê xwediyê xwe û jineke weke te li ber çavên min dewlemendiya herî mezin e; hemû daxwaz û mebesta min ev e; ji bo gihîş-

tina amanceke wiha birûmet ez xwe ji ber tu fedekariyê nadim
alî û astengên herî mezin jî nikarin rê li ber min...

HARPAGON

Hêdî, lawê min, tu dixwazî çi bikî?

CLÉANTE

Ez rêz û hurmetên te pêşkêşî Sitiyê dikim.

HARPAGON

Tu û Xwedê! Zimanê min jî heye, ez bixwe jî dikarim hurmetên
xwe pêşkêş bikim û lazimiya min ji berdevkekî weke te jî tune-
ye. Heydê kursiyan bînin.

FROSINE

Na na; ya baş ew e ku em nesekinin biçin bazarê da ku em zû
vegerin bîn, paşê hûn ê ji xwe re bikêfa xwe xeber bidin.

HARPAGON

Wê gavê bila hespan têxin ber erebê. Li min bibore, delala min,
min qet fikir nekir ku berî çûyîna tiştê îkramî we bikim.

CLÉANTE

Ez fikirîm, bavo, min li ser navê te mirov şand çend lengerî man-
dalîna, limonên şêrîn û rîçal anî.

HARPAGON

(Hêdîka ji Valère re dibêje)

Valère!

VALÉRE

(Li Harpagon vedigerêne)

Hişê xwe winda kiriye.

CLÉANTE

Bavo, tiştên ku min xwestine tu dibêji qey hindik in? Xanimefen-

dî édî bila li qusûrê nenêre.

MARIANE

Nabe, te çima zehmet kiriye.

CLÉANTE

Sitî, te qet heta niha elmasekî ku weke yê vê hinguliska di tiliya bavê min de dibirûsîne dîtiye?

MARIANE

Birastî jî pirî dibirûsîne.

CLÉANTE

(Hinguliskê ji tiliya bavê xwe derdixe û dide Marianeyê)
Ji nêzik ve lê binêre.

MACRIANE

Birastî jî pir xweşik e, wek sotikê êgir dibirûsîne.

CLÉANTE

(Rê li ber Marianeya ku dixwaze hinguliskê vegeîne digre)
Nabe, Sitî. Pir li destê te hat. Bavê min wê diyarî te dike.

HARPAGON

Kî, ez?

CLÉANTE

Ne wiha ye, bavo, tu naxwazî ku ji bo xatirê te wê qebûl bike?

HARPAGON

(Ji lawê xwe re hêdî dibêje)
Çawa?

CLÉANTE

Ev jî gotin e! Çavdike min ku ez wê bi te bidim qebûlkin.

MARIANE

Ez qet naxwazim...

CLÉANTE

Tu henekê xwe dikî? Bavê min careke din wê bi şûn de nagire.

HARPAGON

(Di ber xwe de dibêje)

Vî ez di çavan re derxistim!

MARIANE

Tiştê wiha dibe...

CLÉANTE

(Her xwe dide ber Marianeyê ku hingulîskê venegerîne)

Min carekê got na, dê bavê min li dilê xwe bigre.

MARIANE

Ez ricayê dikim...

CLÉANTE

Hergîz nabe.

HARPAGON

(Di berxwe de)

Qeda bi te keve...

CLÉANTE

Binêre ku tu qebûl nekî ew ê qiyametê rake.

HARPAGON

(Di guhê lawê xwe de)

Weyla! Bênamûsî!

CLÉANTE

(Ji Marianeyê re)

Tu dibînî te dilê wî ji xwe hişt.

HARPAGON

(Hêdîka lawê xwe tehdit dike)

Tu heywan î, çi yî!

CLÉANTE

Bavo, welehî ne sîcê min e. Ji bo ku qebûl bike tiştê ku ji destê min hat min kir, lê ew qebûl nake.

HARPAGON

(Hêdî û bi awayekî bihêrs ji lawê xwe re)

Rêvî!

CLÉANTE

Binêre, Xanimefendî, ji rûyê te bavê min bi min re dixeyide.

HARPAGON

Hêdî, ji lawê xwe re bi heman hersê: Rezîl!

CLÉANTE

Te ew di çavan re teqand. Tu û Xwedê, Sîrî, tu yê êdî israr nekî.

FROSINE

Ji bo Xwedê! Ew qas jî nabe! Piştî ku Mîrza wiha dixwaze tu jî hingulîskê bigre bila biqede.

MARIANE

Ji bo ku ez te zêde neqhefînim bila niha bi min re be; lê ez ê paşê li te vegefînim.

Sehneya Heştan

(Harpagon, Mariane, Frosine, Clèante, Brindavoine, Élise)

BRINDAVOINE

Mîrza, mirovek hatiye dixwaze bi te re bipeyive.

HARPAGON

Jê re bêje, niha karê min heye, bila rojeke din bê.*

BRINDAVOINE

Dibêje ku pere ji te re anîne.

HARPAGON

Li min biborin, ez nasekinim ez ê aniha bêm.

Sehneya Nehan

(Harpagon, Mariane, Clèante, Élise, Frosine, La Merluche)

LA MERLUCHE

(Bi bazdan tê û li bin guhê wî dikeve Harpagon dike xwarê)
Mîrza...

HARPAGON

Ay! Te ez kuştim.

CLÉANTE

Çi bû, bavo? Dereke te êşiya?

* Ger hinek hatin ji min re pere anîn, bazdin zû ji min re bêjin (...); û ku hatin pere xwestin bêjin derketiye, ne li mal e (...) (Sganarelle, 1er scene de Mariage force/Zewaca bîzor, t. 1er, p. 715).

HARPAGON

Bênamûs, ji bo ku tişteki bîne serê min miheqeq ji deyndarên min pere sitendiye.

VALÉRE

Tiştêk tune, meraq nekin.

LA MERLUCHE

Mîrza, li min bibore, min got heta ji min bê ez ê zû baz bidim.

HARPAGON

Tu hatî vir çî, sersem?

LA MERLUCHE

Ez hatim bêjim ku nalên herdu hespan jî ketine.

HARPAGON

Bila zû bibin cem nalbend wan nal bikin.

CLÉANTE

Heta ku hespan nal bikin, bavo, ez ê ji dêvla te ve tişteki îkramî mêvanan bikim, Sitiyê derxim nav baxçe û bêjim bila çerezan jî bînin wir.

HARPAGON

Valère, bila çavê te li wan be; ez ricayê dikim, li wan miqate be, heta ji te hat tiştên ku xwestine ji nav destê wan derxe, em ê dîsa li xwediyê dikanê vegehin.

VALÉRE

Tu wan bisipêre min.

HARPAGON

Oy kurê şîrheram, tu yê li ser ar û ocaxên min rûneyî?

PERDEYA ÇARAN

Sehneya Yekem

(Cléante, Mariane, Élise, Frostne)

CLÉANTE

Heydê em biçin wir, li wir dê serê me rihetir be. Êdî kesekî ku em jê bitirsin li dora me nemaye, em dikarin bi rihetî ji xwe re bi-peyivin.

ÉLISE

Erê, Sitî, kekê min ji min re gotibû ku çendî ji te hez dike. Ez dizanim ku kêmasiyên wiha çendî mirov dixin tengasî û zehmetiyê; bawerîya te ji Xwedê be, ez ji dil û can bi mesela we eleqedar dibim.

MARIANE

Di pirseke wiha de eleqeya keseke weke te dilê mirov hînîk dike û ez hêvî dikim ku tu yê me ji vê dostaniya xwe ya comerda-ne mehrûm nekî, Sitî, ev dostanî dikare hinekî derd û kulên min sivik bike.

FROSINE

Welehî, hûn her du jî mirovên bêsiûd in, berî ku ev tişt hemû bi-qewimin ku we derdê xwe ji min re gotibûna mesele nedigihîşt vê derecê, min ê hûn ji vî derdî xelas bikirina; di dinyayê de min nedihîşt ku mesele bigihe vê dirametê.

CLÉANTE

Tu yê çi bikî? Qey qedera min a xerab wiha dixwest. Baş e, Marianeya delal, biryara te çi ye?

MARIANE

Mixabin! Ez jî nizanim ku ez ê çi xweliyê li serê xwe bikim ? Piştî ku dest û piyên min wiha hatin girêdan, ji dia pê ve, ez karim çi bikim?

CLÉANTE

Bi xweziya dest nagihê baqê keziya, ji dia pê ve gelo tişteki din ji dilê te nayê? Bi tenê dê dilê te bi min bişewite? Ma tu nikarî qenciyeke bi min bikî? Azweriyeke ku vala neseke, bê hewara min di dilê te de tune ye gelo?

MARIANE

Ez dikarim ji te re çi bibêjim? Hema tu xwe têxe şûna min û bifikire bê ez dikarim çi bikim. Tu tişteki ku ez karibim bikim bibîne û emir bike. Ez di emrê te de me, ez dizanim tu miroveki maqûl î û tu yê ji min tişteki ji derveyî edebê û terbiye nexwazî.

CLÉANTE

Heyhat ! Ku tu bi edeb û terbiyê dest û piyên min girêdî wê gavê dê çi ji destê min bê, ez ê karibim çi bikim?

MARIANE

Lê ka ji min re bêje tu dixwazî ku ez çi bikim? Ku ez hemû adetên ku divê em jin li wan miqate bin bidim aliyekî jî, ez nikarim xatirê diya xwe bihêlim. Dayika min a reben bi çi qiriktahliyê ez mezin kirim, ez nikarim tişteki ku di dilê wê de bibê kul û keder bikim. Tu were mala me, wê bibîne û ji bo ku wê îkna bikî tiştê ji destê te bê bike: Tu çi dixwazî bêjî û bikî kêmaniyê nexiyê, va ye ez ji te re dibêjim. Gava ku mesele bi tenê ma li ser daxwaza min, ez amade me ku ez bêjim ez çendî ji te hez dikim.

CLÉANTE

Frosine, Frosineya delal, tu yê alikariya me bikî?

FROSINE

Wî ez qurbana te me! Ma hewceye ku tiştêkî wiha ji min bipirsî? Ez ê canê xwe di ber we de feda bikim. Hûn tebietê min dizanin, ez miroveke pir dilbiraşim im; ez jî însan im, dilê min ne ji kevire, gava ku ez bibînim du mirov ji niyeta xwe ya pak û paqij ji hev hez dikin ku xizmeteke biçûk be jî, bi min biqede ez teksîr nakim. Gelo em ê karibin vê meselê bi çi awayî çareser bikin?

CLÉANTE

Ez ketim bextê te, aqilekî bide me.

MARIANE

Riyeke ronî bi ber me bixe.

ÉLISE

Ji bo plana ku te çêkiriye xera bikî mahneyekê bibîne.

FROSINE

Ev karekî pir zor e. Ku mesele bi tenê diya te bûya rihet bû, diya te ne jineke bêaqil e, bi awayekî mirov dikaribû ew ikna bikira û delalîka ber dilê wê ji dêvla bavê wê ve bidana kurê wî. Lê tiştê herî xirab, bavîtiya bavê we ye.

CLÉANTE

Rast e, gotina te ye.

FROSINE

Ez dixwazim bibêjim ku em berê xwe jê biguherin, ew ê jî diranan li me tûj bike, paşê em ê nikaribin ji bo zewaca we wî razî bikin. Divê em li riyeke bigerin ku ew bixwe te nexwaze û wî vir de, wir de bibin û bînin ku ji te sar bikin.

CLÉANTE

Xebera te ye.

FROSINE

Erê, ez baş dizanim ku xebera min e. Tiştê ku lazim e ev e; lê ji bo ku em çareyekê ji vê re bîhînin aqilekî şeytanî lazim e. Hela bisekinin; ku em jînişî hinekî navsere bîhînin, hinekî weke min ji heqderketî be û xwedî qahîliyetê ku karibe rola jînişî kubar ji jînişî malmezînan bîlîze, em ê wê gavê wê weke divê bixemilînin, navekî seyr ji wan navên markîz an vikontesan jê re peyde bikin, bîjînişî ku ew yek ji esîlza-deyên Bretagneya jînişî e, wê gavê ez ê hemû maharetên xwe bikar bînim û hawerîya bavê we pê bînim ku jînişî zengîn e û ji xeynî qesr û qonaxan ve sed hezar eku pereyên wê yên jîmarî hene û ez ê jê re xweş bikim bîjînişî ku jînişî bî awayekî nedîti aşîqî wî bûye, ji bo ku pê re bîzewice dikare canê xwe bide û raziye ku anîha bî peymana mah-rê hemû mal û milkê xwe bîdîyê; ez hawerînişî ku ew ê ji teklîfeke wi-ha re guhê xwe negire; welhasil, ez dizanim ku pîrî ji te hez dike; lê ew ji pereyan hînişî betir hez dike; piştî ku bî vê yekê xapiya û ji mahra we re dengê xwe nekir, paşê hîla haya wî jê çêbibe ku pênc qurûşê bî-qul jî di berîka markîzê de tunene û bike hewar, ji me re çî.*

CLÉANTE

Ev fikrekî pîr baş e.

FROSINE

Tu vê meselê bîspêre min. Jînişî ji hevalên min hate bîra min, ji bo ka-rekî wiha peyde nabe.

CLÉANTE

Frosine, bawer bike ku tu tiştêkî wiha bîkî, heta bî hetayê ez ê vê qe-nîya te ji bîra nekim. Lê, Marianeya şêrîn, ez heyrana çavên te, divê em

* Ji ber vê teswîra Frosîneyê bîner dikarin zen bikin ku dê paşê markîzeke sexte derkeve ser sehnê. Di teatira hevdem de, divê mirov xwe ji tesewîrên wiha bê-encam ku karînişî lê bî xeyalên bîncran bîgrînişî bîparêze. Lê Molière, li vir xwestiye di derheqê dek û dolavên Frosîneyê de fikrekê bîde mirov.

herî her tiştî diya te îkna bikin; ku em bitenê karihin rê li her vê zewacê bigrin ew jî baş e. Ez ketim bextê te, tu jî ji aliyê xwe de neseke, tiştê ku ji destê te bê textsîr neke; madem ku ji te hez dike ew ê nexwaze ku tu xemgîn bibî, tu jî ji vê yekê baş îstifade bibe; Xwedê hêzek daye çavên te û zimanê te, ku tu karî bi wan her daxwaza xwe bînî cih, ji vî nametî heta ku tu karî îstifade bibe û ji hîra neke ku divê tu wan peyvên xweş, herbedan û libergeriyanan, hezkirin û mizdanên ku karin dilê kevirî nerm bikin îhmal nekî.

MARIANE

Ez ê tişteki jî bîra nekim û tiştê ku ji destê min bê jî ez ê textsîr nekim.

Sehneya Duduyan

(Harpagon, Clèante, Mariane, Élise, Frosine)

HARPAGON

Wey! Lawik destê dêmariya xwe ya pêşerojê maçî dike, ew jî qet ne bi min e û ne bi te ye, dengê xwe nake. Nexwe mûyek di vî mastî de heye?

ÉLISE

Vaye bavê min hat.

HARPAGON

Erebe amade ye, kengî kêfa we bixwaze hûn dikarin biçin.

CLÉANTE

Bavo, madem tu naçî, ez ê bi wan re herim.

HARPAGON

Na, tu raweste. Ew dikarin bi tenê jî biçin; him karê min bi te heye.

Sehneya Sisiyan
(*Harpagon, Cléante*)

HARPAGON

Guhdariya min bike, bêyî ku tu bi çavê dêmariyê lê binêrî bêje, ji vê keçikê çi dikeve serê te?

CLÉANTE

Çi dikeve serê min?

HARPAGON

Erê, ji tevgera wê, ji bejn û bala wê, ji xweşikbûna wê, ji aqilê wê?

CLÉANTE

Hoho!

HARPAGON

Ka bêje bê tu çi difikirî?

CLÉANTE

Tu bixwazî ku ez ji te re rastiyê bêjim, ne keçeke weke ku min hêvî dikir e. Birastî hinekî tiredînî xuya ye; bejna wê bi min wiha sêwleqî ye, xweşikbûna wê di nav erê û na de ye, ez dibêm aqilê wê jî netemam e. Tu nebêjî qey ku ez dixwazim te jê sar bikim, havo; piştî ku bû dêmarî ha ew, ha yeke din ji bo min ferq nake.

HARPAGON

Te ew peyv hemû ji bo vê jê re dikirin...

CLÉANTE

Min li ser navê te hinekî dilê wê xweş kir, çend peyvên şêrîn jê re kirin, ew jî ji bona xatirê te bû.

HARPAGON

Ango qet meyla te ne bi ser de ye, tu jê hez nakî?

CLÉANTE

Ez? Ez ê ji bo çi jê hez bikim.

HARPAGON

Heyf û mixabin; tişteke hatibû aqilê min, lê ez dibînim ku wê ne-be. Gava min keçik li vir dît, ez hinekî li rewşa xwe û temenê xwe fikirîm; min got ku xelk û alem bibihîze, ku min keçeke wi-ha ciwan mahr kiriye dê têr henekên xwe bi min bikin. Ji bo wê jî min biryara xwe da ku ez dev ji vê yekê berdim û piştî ku min ew xwestibû, me soz jî dabû hev, ku hinekî jî bi te xweş hatibû-na min ê ew bidana te.

CLÉANTE

Bidana min?

HARPAGON

Erê, min ê ew bidana te.

CLÉANTE

Bi jinî?

HARPAGON

Erê, bi jinî.

CLÉANTE

Bavo, hela ji kerema xwe re hinekî guh bide min. Rast e, min zê-de jê hez nekir; lê ku tu bixwazî, bavo, ji bo xatirê te ez ê pê re bizewicim.

HARPAGON

Ez? Na na ez ne mirovekî ewqas zalim û bêînsaf im; piştî ku ne bi dilê te ye, çi heqê min heye ku ez gunehê te têxim stuyê xwe.

CLÉANTE

Tiştek nabe, piştî ku te xwestiye bila wek te be.

HARPAGON

Na, na; zewaca bêdil tu xêra wê tuneze, ji mirov re ji serêşiyê pê ve tişteki din nîne.

CLÉANTE

Bavo, dibe ku em paşê jî li hev bibanin; pêşiyên me gotine, eşq û evîn piştî zewacê tê.

HARPAGON

Nexêr; gava dilê lawik di keçikê de tunebe ev yek qet naçe serî, taliya wê xêr tê tuneze, ez nikarim gunehê te têxim situyê xwe. Ger ku keçik bi dilê te bûya, wê gavê dibû; li şûna xwe, min ê tu pê re bizewicandana; lê piştî ku wiha nebû, ez li ser soza xwe ya ewilî me, ez ê wê li xwe mahr bikim.

CLÉANTE

Hema wiha! Bavo, piştî ku mesele gihîştîye vê dirametê, divê ez ji te re dilê xwe vekim, rastiya xwe bêjim. Tu rastiye bixwazî, ji wê roja ku ez lê rast hatim, wexteke seyrane bû û vir de, ez jê hez dikim; min biryara xwe dabû ez ji te re bêjim ku tu wê ji min re bixwazî; ku min niyeta te fêm nekira û negota tu yê xwe aciz bikî, kesekî nikaribû rê li ber min bigirta.

HARPAGON

Tu qet çûyî mala wan?

CLÉANTE

Erê, bavo.

HARPAGON

Gelek caran?

CLÉANTE

Ji bo wexteke wiha kurt, pir tê hesêb.

HARPAGON

Baş miqateyî li te kirin?

CLÉANTE

Bêyî ku zanibin bê ez kî me, li min pir miqate bûn; şaşbûna Marianeyê jî ji ber vê yekê bû.

HARPAGON

Te jê re ya dilê xwe got û te got ku ez dixwazim bi te re bizewicim?

CLÉANTE

Bêgûman; heta min hinekî li guhê diya wê jî xist.

HARPAGON

Kêfa diya wê jî hinekî ji vê yekê re hat?

CLÉANTE

Erê, pir kêfa wê jê re hat.

CLÉANTE

Û keçik, ew jî biqende ku tu jê hez dikî, ji te hez dike ?

CLÉANTE

Erê, bavo, gava ez dîna xwe didimê ez sedî sed bawerim, ku ew jî ji min hez dike.

HARPAGON

Pir baş bû ku haya min ji vê yekê çêbû; baş guhdariya min bike, lawê min, zanibe bê ez ji te re çi dibêjim. Hê! Lawê min, tu dizanî ku divê tu çi bikî? Ji kerema xwe re, divê tu baş bifikirî û dev

ji vê evînê berdî, wê ji ser guhê xwe bavêjî; hêviya xwe ji vê jî-nika ku ez dixwazim bibirî; divê tu bi yeke ku ez ji te re minasib bibînim re bizewicî.

CLÉANTE

Wey, bavo, tu ji sibê de henekê xwe bi min dikî! Bila wek te be! Piştî ku ev mesele gihîşt heta vê radeyê, ez ê jî, ji bo Marianeya ku kesek nikare hezkirina wê ji dilê min derxe, ji bo ez nehêlim bi te re bizewice, tiştê ku ji destê min bê ez teksir nakim, ku diya wê aliyê te bigre û bixwaze wê bi te de jî, ji me re jî xwedê mezin e, gelek rê û dirbên din ku em pê bighên mirad û meqse-da xwe hene.

HARPAGON

Çawa, bênamûs? Tu dixwazî bêşerm û bêfedî bikevî ber qismetê min?

CLÉANTE

Esil tu dixwazî têkevî ber qismetê min; min berî te ew naskir û jê hez kir.

HARPAGON

Qey ez ne bavê te me, lawo? Ma navê ku mirov rêz û hîmeta dê û bavên xwe bigre, hey qeşmer!

CLÉANTE

Di meseleyeke wiha de tu kes ne mecbûr e, ku ji bo bavê xwe fedekariyê bike; mesela dil ray lê nabe.

HARPAGON

Ku min wiha çend darên tûj li te xistin, ez ê nîşanî te bidim bê tu guhdariya min dikî yan na.

CLÉANTE

Hemû zirt û fortên te nema li ser guhekî min in jî.

HARPAGON

Tu yê dev ji Marianeyê berdî.

CLÉANTE

Hergîz, ez dev jê nagerim.

HARPAGON

Tu ka darekî bide min.

Sehneya Çaran

(Hoste Jacques, Harpagon, Cléante)

HOSTE JACQUES

Wey, wey, wey, Mîrzayên delal, ev çi ye, ev çi hal e? We hişê xwe beradaye qey?

CLÉANTE

Qey zarok li hember te hene, tu yê min bi dar bitirsînî!

HOSTE JACQUES

Wî! Mîrza, ev çi peyvin!

HARPAGON

Tu yê li hemberî min wiha zimandirêjiyan hikî ne!

HOSTE JACQUES

Wax! Mîrza, ez ketim bextê te û Xwedê tu yê bêhna xwe fireh bikî.

CLÉANTE

Dinya li serê min rabe ez ji ser yek û duduya xwe danakevim.

HOSTE JACQUES

Hê yawel? Tu çawa li hemberî bavê xwe derdikevî?

HARPAGON

Tu dev ji min herde, ez dizanim ku ez ê çi bînim serê wî.

HOSTE JACQUES

Wey tu dikî çi biki? Ma tu yê li lawê xwe bixi? Ku te li min xista jî disa tiştekek nedibû.

HARPAGON

Hema tu hakim, Hoste Jacques, li ser bextê te ka tu bêje ez neheq im.

HOSTE JACQUES

Temam ser çavan.

(Vedigere ser Cléante)

Hela tu hinekî wê de here.

HARPAGON

Dilê min di keçekê de heye, ez dixwazim pê re bizewicim û vî bênamûsî jî birûyekî rûşûştî çavê xwe beradayiyê, li hemberî min tê û dixwaze wê ji her min bigre.

HOSTE JACQUES

Na! Li te neheq e.

HARPAGON

Ku mirov bi havê xwe re qayîşê bikşîne, rezaletêke ji vê mezintir heye gelo? Ma navê ku mirov hedê xwe zanibe û birêzdarî xwe ji xwestiya havê xwe biparêze?

HOSTE JACQUES

Gotina te ye. Bihêle ez ê pê re bipeyivim, ji kerema xwe re tu xwe hinekî li vir ragire.

(Diçe wî seriyê sehnê cem Cléante.)

CLÉANTE

Ser çavan! Erê, piştî ku wî tu weke hakim hilbijartiyî, ez qet xwe ji ber heqiya ku tu yê dînî nadim alî; tu dibî, yekî din dibe ji bo min jî ferq nake; ez jî helkirina pîrsa di navbera me de dispêrim te, hostê Jacques, lê divê herî ez jî ji te re derdê xwe bêjim.

HOSTE JACQUES

Ev yek ji bo min jî rûmeteke mezin e.

CLÉANTE

Ez evîndarê keçeke ciwan im, ku dilê wê jî di min de heye û min doza zewacê lê kir ew jî ji dil dixwaze bi min re bizewice; bavê min jî niha rabûye vê keçikê dixwaze û dike weke Beko Ewan navbera me xirabike.

HOSTE JACQUES

Birastî jî ne baş kiriye.

CLÉANTE

Qey ji ber temenê xwe jî fedî nake, ku dixwaze bizewice? Qey rûyê wî jî ji mirov naşewite, yên wek wî çima ji seranû ve aşiq bibin? Him navê ku berî rê bide zarokên xwe yên ku xortîxame ne?

HOSTE JACQUES

Heqê te heye weleh, hêrêti kiriye. Ka raweste ez jê re du gotinan bikim.

(Vedigere tê cem Harpagon.)

Na lo herê! Lawê te weke ku tu dibêji ne ser hişk e û hêdî hêdî tê ser rê. Dibêje ku divê mirov rêz û himmeta bavê xwe bigre û ji riya wî dernekeve, cara ewil xwe negirtiye hinekî sergermîti kiriye, lê niha amade ye ku hemû daxwazên te pêk bîne, bi tenê dixwaze ku tu hinekî pê re bixweşikî bidî û bistîni û wî bi keçeka ku ew dixwaze re bizewicîni.

HARPAGON

Ya! Ku wiha be, Hoste Jacques, jê re bêje wekî din çi ji min bixwaze

ez ê weke wî hikim û ji xeynî Marianeyê, ez wî serbest dikim, kê dixwaze bila bixwaze ez ê jê re bînim.

HOSTE JACQUES

Tu qet meraq neke.

(*Diçe ha lawik.*)

Na bavo! Bavê te ne yekcar weke ku tu dibêji bementiq e û ji min re got ku ew jî ji ber sergermîtiya te hinekî aciz bûye, bîhna xwe teng kiriye; bitenê helwesta te ya hişk hinekî pê nexweş hatiye, tu çi bixwazî aniha amade ye ku hîke, bi şertê ku tu pê re bişêrînayî danûstandinê hikî, li hemberî wî terbiya xwe xira nekî, kêmaniyê nexî hurmet û berpirsiyariyên xwe yên li hemberî wî.

CLÉANTE

Ax! Hoste Jacques, tu dikarî jê re himisogerî bêji ku, ger ew Marianeyê bide min, ez ê bibim mirovê herî sernerm, ku ji min re çi bêje ez ê biya wî hikim û ez ê tu carî tiştekî bêyî riza wî nekim.

HOSTE JACQUES

(*Ji Harpagon re*)

Mesele qediya çû. Amade ye ku tu çi bêji wek te hîke.

HARPAGON

Ez jî ji Xwedê de li tiştekî wiha digirim.

HOSTE JACQUES

(*Ji Cléante re*)

Mesele hal hû çû. Ji sozên ku te dan gelekî memnûn e.

CLÉANTE

Ox! Mala Xwedê hezar carî ava!

HOSTE JACQUES

Mîrza, ji niha bi şûn de divê hûn ji xwe re rûnên bi hev re xeber bidin. Hûn li hev hatin êdî; ji ber ku we guhdariya hev ne-

dikir, we dikira li hev bixista.

CLÉANTE

Hoste Jacquesê delal, ez ê vê qenciya te heta mirinê ji bîra nekim.

HOSTE JACQUES

Ma min ji te re çi kiriye, Mîrza.

HARPAGON

Te ez ji belayekê xelas kirim, Hoste Jacques û ev qenciya te beramberî her tiştî bû. De here, ez soz didim te, ez vê qenciya te ji bîra nakim.

(Gava destê xwe tavê berika xwe destmala xwe derdixe, Hoste Jacques dibêje qey ew ê tişteki bide min.)

HOSTE JACQUES

Xwedê kêmaniya te nede, ez destê te radimîsim.

Sehneya Pêncan
(Cléante, Harpagon)

CLÉANTE

Bavo, li min bibore, bîstika din min xwe negirt hinekî sergermîti kir.

HARPAGON

Tiştê nabe, 'li biçûkan qusûr, li mezinan efû' gotine.

CLÉANTE

Bawer bike, ez ji ber tiştê ku min kiriye pir poşman im.

HARPAGON

Ji ber ku min jî tu wiha rûnêrm û bîaqil dîtî, ez gelekî şad û bextewer im.

CLÉANTE

Ji ber ku te bêrêtiya min wiha zû ji bîra kir, te qenciyeke mezin bi min kir.

HARPAGON

Gava ku zarokên mirov wezîfa xwe zanibin, mirov kêmaniyên wan zû ji bîra dike.

CLÉANTE

Tu niha rast dibêji? Ji ber bêrêti û sergermîyên ku min kirin girê te niha ji min nayê?

HARPAGON

Piştî ku tu wezîfa xwe zanibî, kêmaniyê nexî rêz û hurmeta li hember mezinên xwe, ez ê çima girê te bigrim.

CLÉANTE

Bi sozê mêrê çê, bavo, bîranîna vê qenciya te heta bi gorê dê ji dilê min demekeve.

HARPAGON

Ez jî, soz didim te ku tu çi ji min bixwazî ez nema ji te re dibêjim na.

CLÉANTE

Ax! Bavo, ez nema tiştekî din ji te dixwazim; piştî ku tu Mariane-yê bidî min ez ê hîn çi yê din ji te bixwazim.

HARPAGON

Te got çi?

CLÉANTE

Bavo, min got ku ez ji te razî me, Xwedê jî ji te razî be. Piştî ku te Mariane da min weke ku te malê dinyê hemû da min.

HARPAGON

Kê ji te re gotiye ku ez ê Marianeyê bidim te?

CLÉANTE

Te, bavo.

HARPAGON

Min!

CLÉANTE

Bêgûman.

HARPAGON

Tiştê wiha dibe ? Esil te soz da ku tu yê dev jê berdî.

CLÉANTE

Ez ê dev jê berdim?

HARPAGON

Erê.

CLÉANTE

Tiştê wiha di dinyayê de nabe.

HARPAGON

Tu hîn li ser yek û duduya xwe yî?

CLÉANTE

Berevajiya wê, ez di vê meseleyê de ji her gav bêtir îsrar dikim.

HARPAGON

Tu dibêjî çî? Bênamûs, te disa dest bi dehyeka xwe kir?

CLÉANTE

Dinya jî li serê min rabe ez dev jê bernadim.

HARPAGON

Tu bisekine hela, ku ez çawa havê te bînim pêş çavê te.

CLÉANTE

Tu çi dikî bike, tu bêminetî.

HARPAGON

Careke din çavê min li van sî û sitaran bi te nekeve, te fêm kir?

CLÉANTE

Ser çavan, bila wek te be.

HARPAGON

Here, êdî tu ne tişteki min î.

CLÉANTE

Ne tişteki te, ne tişteki te...

HARPAGON

Ji niha û pê ve tu ne lawê min î.

CLÉANTE

Tu nabêji min çi xêr ji te dîtiye.

HARPAGON

Ez te ji mal û milkên xwe jî mehrûm dikim.

CLÉANTE

Bi cehnima mîratê te kiriye.

HARPAGON

Heram li te be.

CLÉANTE

Xwedê ji te re nehêle, ez çawa bikim ji te re.

Sehneya Şeşan
(*La Flèche, Cléante*)

LA FLÉCHE

(Pêstexteke biçûk di destê wî de ji nav baxçe tê) Ax! Mîrza, tam di wexta wê de ez li te rast hatim! Zû bide pey min.

CLÉANTE

Çi bû, çi qewimî?

LA FLÉCHE

Bide pey min, ez ê niha ji te re bêjim: "Em xenê bûn."

CLÉANTE

Çawa?

LA FLÉCHE

Ev e tiştê ku ji te re lazim e.

CLÉANTE

Tiştê ku ji min re lazim e çi ye?

LA FLÉCHE

Ji sibê de ez lê dinêrim.

CLÉANTE

Ew çi ye?

LA FLÉCHE

Xizna bavê te ye, ketiye destê min.

CLÉANTE

Te çawa ew bi dest xist?

LA FLÉCHE

Ez ê paşê hertiştî ji te re bêjim. Divê em birevin, guh bidêre dengê hawara wî ji niha ve tê.

Sehneya Heftan
(*Harpagon*)

(Ji nav haxçe de dike hawar û tê, dibêje dizan bigrin û bêşewqe derdikeve tê ser sehnê.)

Haho diz hat! Dizan bigrin! Qatilan bigrin! Agir bi mala min ket! Hawar e, hawar Xwedê! Mala min xira kirin, wan ez kuştim, benik xistin situyê min, perê min ji min dizîn. Kî bûn, çi kes bûn? Bi ku de çûn? Li ku ne? Xwe xistin kîjan qulê? Ez ê çawa wan bigrim? Divê ez bi ku de bazdim? Bi ku de baz nedim? Hawara xwe bibim kê? Ne li wê bin gelo? Ne li vir in? Ew kî ye? Rawest e. Perên min bide min bênamûs...

(Bi milê xwe girtiye.)

Wey! Ev ez im. Hişê min ji serê min çû, ez nema zanim ku ez li ku me, ez kî me, ez çi dikim. Heywax! Perekê min, dostê min ê hêja! Tu ji destên min derxistin birin; piştî ku tu ji destê min derxistin, debara min nema dibe, sebra min, bexteweriya min dizîn; hertiştê min çû ji destê min, tiştê ku ez bikim nema li ser rûyê vê dinyayê. Bêyî te ez ê çi bikim, ez nikarim bijîm. Qediya çû, êdî tiştê ku min nema; ez ê xwe bikujim, ez mirim, ez ketim bin erdê. Ji bo xwedê kesekî ku bi milê min bigre min rake ser piyan tune, kesekî ku perê min ê şêrîn li min vegerîne tune, yan kê perê min bir ji min re bêje? Weh! Te got çi? Kesek tune qey. Her kî be yê ku ez tazî kirim, haya wî baş ji min hebûye; tam di wexta ku bi wî kurê xwe yê bênamûs daketim e, karê xwe qedandiye. Tu ka ez derkevim biçim giliyê xwe li cem polis bikim, bila bê li wan bixe, ifadeya maliyan hemûyan bigre. Ya xizmetkaran, a xulaman, a kur, a keçê, heta ya min jî bila bigre.

(Bîneran nîşan dide)

Min jî çendî mirov li xwe vehewandine! Ez li kîjanî dinêrim ez jê dikevim şikê, ez dibêm qey kesê ku ez tazî kirime ew e. Weh! Tu ka ez li wan kesên li wir binêrim bê bahsa çi dikin? Gelo behsa yê ku perê min dizî ne dikin? Ew çi qerebalixiye li jor? Diz li wir e gelo? Ji bo Xwedê, heke we yê ku diziya min kiriye dîtibe, yan bihîstibe ji min re jî bêjin, xwe di nav we de veneşartiyê gelo? Hemû jî ziq li min dinêrin û hîqehîqê wan e dikenin. Hûn ê niha binêrin tiliya hemûyan di vê diziyê de heye. Heydê zûka, bila komîser, zeptiye, çawîş, hakim, qeyd, zincîr, sêdar û celad hemû hazir bin. Ez ê herkesî bidar dakim; ku ez perê xwe nebînim, ez ê xwe jî bidim bidardakirin.

PERDEYA PÊNCAN

Sehneya Yekem
(Harpagon, Komîser, Katibê Wî)

KOMÎSER

Bihêle ez dizanim ku ez çî dikim, ev karê min e, mala Xwedê ava ez jî heqî karê xwe derdikevim. Ev ne cara ewil e ku ez diziyê derdixim meydanê; xwezîka ku serê her mirovê min ew da bidardakirin hezar frankê min hebûya.

HARPAGON

Divê hemû karmendên dewletê bi vî karî ve rabin; him ku perê min nebînin ez ê mehkeman jî bidim mehkemê.

KOMÎSER

Divê em li gor usûlê vî karî tehqîq bikin. Te got di pêştextê de çi-qas pere hebû...?

HARPAGON

Deh hezar ekuyê sererast ê jimartî.*

KOMÎSER

Deh hezar eku!

HARPAGON

Erê deh hezar eku!

* Bihayê ekuyekî zêr deh hezar banknot bûn. Perê ku hatiye dizîn serweteke mezin e.

KOMÎSER

Pereyekî hêja ye ku mirov bidize.

HARPAGON

Pereyekî ewqas hêja ye, ku kê ev cinayet kiribe mirov çendî ceza bidiyê disa têrê nake; ger ku ev dizî bêceza bimîne bêje xwe hemû tiştên herî pîroz di xeterê de ne.

KOMÎSER

Ev pere çi cûre bû?

HARPAGON

Louisên xalis zêr û pistoleyên wek sotikê êgir bûn.*

KOMÎSER

Tu di derheqê vê diziyê de ji kê bişik î?

HARPAGON

Ez ji herkesî bişik im; ji bo wê ji ez dixwazim ku hûn hemû xelkê bajêr û derdorê bigrin.

KOMÎSER

Guhdariya min bike, divê mirov zêde welwelê çêneke, bêpêjin û his hin defîlan hîdest hixe, ku carekê em bi ser şopa wî vehûn û pê ve, bi hêza hukûmetê ji nav destê diz derxistina perê te pir hêsan e.

Sehneya Dudyuan

(Hoste Jacques, Harpagon, Komîser, Katibê Wî)

HOSTE JACQUES

Ji dawiya sehnê derdikeve, ber bi aliyê ku jê de tê dizîvir e. Ez ê aniha bêm. Zû benekî ji min re têxin sitûyê wî; piyên wî bidin ser êgir,

* Bihayê louisê zêr û pistole yazdeh banknot bûn.

wî têxin nav ava kelandî, wî ji min re bi beştê esrexê ve daleqênin.

HARPAGON

Kê? Diz?

HOSTE JACQUES

Ez bahsa herazekî şîr ê ku nazirê te ji min re şandiye dikim, tu hisekine bê ez xwarineke çawa jê çêdikim.

HARPAGON

Niha ne hewara xwarinê ye; tu guhdariya min bike bê ez ji te re çi dibêjim.

KOMÎSER

Qet netirse. Ez ne ji wan kesên ku xerabiyê bi te bike me, bêyî ku çipizkek bi kesî bihe emê vî îşî hal bikin.

HOSTE JACQUES

Mîrza jî mêvanê te ye?

KOMÎSER

Dostê delal, divê hûn tişteki ji axayê xwe veneşêrin.

HOSTE JACQUES

Welehî, begê min, ez ê hemû hunerê xwe bikar bînim û heta ji destê min bê ez ê we memnûn bikim.

HARPAGON

Mesele ne ev e.

HOSTE JACQUES

Ger ku ez nikaribim sifreyeke weke ez dixwazim kamil hazir bikim, wê gavê sûc ê nazir efendiyê te ye, ku ji bo zêde mesrefê neke dest û piyên min girêdaye.

HARPAGON

Ehmeq, kes ji te re bahsa xwarinê nake; tu ji min re bahsa perê min ê ku hatiye dizîn bike.

HOSTE JACQUES

Perê te dizîne?

HARPAGON

Erê, hênamûs; tu aniha pereyên min neynî, ez ê jî te bidar dakim.

KOMÎSER

Ji bo Xwedê! Devê xwe jê berde, guneh e. Ji tevgera wî xuya ye ku mirovekî saf e, beyî ku mirov wî havê hepsê her tiştê ku zaniye dê li xwe mukurê û ji me re bêje. Erê, dosto, ku tu li xwe mukurêyî ez nahêlim ku kesek jî destê xwe bi te bike û bi ser de jî tu çi bixwazî dê axayê te bide te. Îro perê wî hatine dizîn, miheqeq di derheqê vê yekê de tu jî tiştêkî zanî.

HOSTE JACQUES

(Xwe bixwe)

Aniha tam wexta ku ez heyfa xwe ji nazir efendî bistînim e. Ji roja ku piyê xwe avêtiye vê malê, herkes wî li ser serê xwe dike, çi bixwaze weke wî dibê û hîn êşa darên ku gava din li serdilê min xistine ji bîra min neçûye.

HARPAGON

Tu çi devê xwe tev dibî û tînî?

KOMÎSER

Dev jê bigere. Xuya ye ew wê biya te bike, min ji te re negot mirovekî rast xuyaye.

HOSTE JACQUES

Mîrza, ger tu bixwazî ku ez rastiye ji te re bêjim, ez dibêim qey tiliya Mîrza nazirê te yê delalî di vî karî de heye.

HARPAGON

Valère?

HOSTE JACQUES

Erê.

HARPAGON

Mirovê min ê ku bi min ewqas sadîq xuya bû?

HOSTE JACQUES

Erê, ew bixwe. Bi min wiha xuyaye ku wî diziya te kiriye.

HARPAGON

Çima bi te wiha xuyaye?

HOSTE JACQUES

Ez wiha difikirim... Bi min wiha xuyaye.

KOMÎSER

Lê divê tu ji me re bêjî, hê tu ji ber çi wiha difikirî.

HARPAGON

Te qet dîtiye ku li dora cihê ku min perê xwe lê veşartibû diçû û dihat?

HOSTE JACQUES

Helbet min dîtiye. Te perê xwe li ku veşartibû?

HARPAGON

Li nav hexçe.

HOSTE JACQUES

Birastî jî; li nav haxçe diçû û dihat. Û te perê xwe xistibû çi?

HARPAGON

Min ew xistibû hundirê pêstextekê.

HOSTE JACQUES

Vaye eyn weke ku tu dibêji. Min dit ku pêstextek di destê wî de bû.

HARPAGON

Baş e, pêstexteyeke çawa bû? Ez ê niha bibînim ku ya min e yan na.

HOSTE JACQUES

Te got pêstexteyeke çawa bû?

HARPAGON

Erê, ka bêje bê çawa bû.

HOSTE JACQUES

Dê çawa be...weke pêstexteyekê bû.

KOMÎSER

Me fêm kir. Lê ka ji me re hinekî tarîf bike, ku em bizanibin bê ew e yan ne ew e?

HOSTE JACQUES

Pêstexteyeke mezin bû

HARPAGON

Ya ku ji min dizîne biçûk bû.

HOSTE JACQUES

Rast e, gava mirov ji dervede lê binêre biçûk e; lê min ji bo tiştên di hundirê wê de got mezin e.

HARPAGON

Baş e, çi reng bû?

KOMÎSER

Erê ka bêje.

HOSTE JACQUES

Rengê wê... renek ji wan rengên... Hûn jî nikarin alî min bikin ku bê bîra min?

HARPAGON

Ehe?

HOSTE JACQUES

Ne sor bû?

HARPAGON

Na cûn bû.

HOSTE JACQUES

Wî! Erê, cûnê sor bû. Min jî dixwest ez vê bêjim.

HARPAGON

Qet şik tê tune. Miheqeq ew e. Binivîse, Mîrza, ifadeya wî binivîse. Ji bo Xwedê! Ji îro û pê ve ez ê bi kê bawer bibim? Tobe ez careke din bi peyvên qelew bawer nabim; piştî ku min ev yek dit, baweriya min nema bi min jî tê.

HOSTE JACQUES

Mîrza, vaye nazirê te vegeriya tê. Jê re behsa min nekin, nebî ku hûn bêjin ez lê mukur hatime.

*Sehneya Sisiyan**(Valère, Harpagon, Komîser, Katibê Wî, Hoste Jacques)*

HARPAGON

Were vir. Were li finasê xwe yê genî, li vê suîqesta nedîtî ku te kiriye mukure hela.

VALÈRE

Tu çi dibêjî, Mîrza?

HARPAGON

Çawa, bênamûs, ji ber vê cinayeta ku te kiriye rûyê te ji mirov jî naêşe?

VALÈRE

Tu behsa cinayeta çi dikî, malava?

HARPAGON

Ez behsa cinayeta çi dikim, rezîl! Weke ku tu nizanî ez behsa çi dikim, tu wiha xwe ji binî derdixî. Beleheq xwe wiha vir de û wê de nede, pûş bi ser re ranexê; mesele derketiye holê û ji min re ta bi derziyê vekirine. Te yê qenciya min li min wiha veheranda, tu wiha bi dostanî bi dora min ketî û ketî nav mala min? Te yê ev lîsk baniya serê min?

VALÈRE

Mîrza, madem hertişt ji te re gotine, ez qet xwe vir de wê de nadim û ez li tişteki jî nadim mandelê.

HOSTE JACQUES

Ox! Ox! Nexwe bêyî ku haya min jê hebe min rast texmîn kiriye.

VALÈRE

Min jî dixwest ez vê meselê bi te re xeber bidim, lê ez li benda

wexteke hîn minasibtir bûn; lê piştî ku hertişt derketiye meydanê, ez xulamê te me bîhna xwe teng neke û hinekî guhdariya min jî bibe.

HARPAGON

Tu yê hîn çi bidî her rûyê xwe, dizê heram!

VALÉRE

Wey! Mîrza, ez ne mistehqê van peyvên ku tu ji min re dikî me. Rast e, belkî min hinekî neheqî li te kiriye; lê, tevî vê jî, heqê te tune ye tu ji min re van peyvan bikî.

HARPAGON

Ji bo kemîneke wiha? Cinayeteke wiha? Çawa heqê min tune ye?

VALÉRE

Ez ketim bextê te, tu yê bêhna xwe ewqas teng nekî. Gava tu guhdariya min bikî, tu yê bibînî ku qusûra min bi qasî ku tu zen dikî ne mezin e.

HARPAGON

Sûcê te biqende ku ez texmîn dikim ne mezin e! Çawa? Te dil û cegera min parçekir ji xwe re bir, qeşmer?

VALÉRE

Dil û cegera te, Mîrza, neketiye nav destê kesên xirab. Mala Xwedê ava hal û wextê min li cih e, tu zerarê ji min nabînî û tu kêmaniyeke min a ku ez nikaribim telafî jî bikim tune ye.

HARPAGON

Jixwe ez jî vê dixwazim, divê tiştê ku te birîye tu aniha bi şûn de bînî.

VALÉRE

Qet meraq neke, namûsa te ya min e jî, ez nahêlim bi qasî serê derziyê zerar bigihêyê.

HARPAGON

Tu tiştêkî ku eleqa wê bi namûsê hebe di vê meselê de tune. Lê, ka ji min re bêje, niha kê ev riya wiha baş biber te xist.

VALÉRE

Wey! Ma tu hîn dipirsî jî?

HARPAGON

Erê, ez ê bipirsim helbet.

VALÉRE

Xwedayekî ku hemû tiştên bi mirov dide kirin efû dike: Eşq, evîn.

HARPAGON

Evîn?

VALÉRE

Erê, evîn.

HARPAGON

Çi eşq û çî evîn, welehî pir baş e! Evîna lousên min ên zêrîn, li tu derên din peyde nabe tiştê wiha.

VALÉRE

Na, Mîrza, bi qasî serê derziyê jî çavê min ne li dewlemendiya te ye; tiştê ku rohnî di çavên min de nehiştiye ne zêrîn te ne, tu bi tenê ya di destê min de ji min re bihêle, wekî din tu dika-rî sedî sed bawer bikî ku qet çavê min ne li qurûşekî te ye jî.

HARPAGON

Hergîz, tiştê wiha di heyatê de nabe! Ku ez vê yekê ji te re bi-hêlim bila di bin min re mêr tunebin. Tu ji xwe re li aqilê wî bi-nêrin, bi çî cesaretê tiştê ku te ji min diziye tu dixwazî nedî min!

VALÉRE

Ma ev dizî ye?

HARPAGON

Erê dizî ye, ma çi ye? Te xezîneya min biriye û tu hîn jî dipirsî dibêji ma ev dizî ye!

VALÉRE

Erê rast e, xezîne ye û bêguman xezîneya te ya herî biqîmet e jî; lê ku tu wê ji min re bihêlî winda nabe. Ez xwe tavê dest û piyên te, tu yê vê xezîneya wiha xwîngêrin bidî min. Ku tu wê bidî min tu yê xêreke pir mezin bi min bikî.

HARPAGON

Tiştê wiha di dinyayê de nabe. Ev çi qeşmerî ye?

VALÉRE

Me carekê soz daye hev û me ji hev re sond xwariye ku em tu caran ji hev naqetin.

HARPAGON

Ez heyrana vê sondê me û ji sozeke wiha re jî gotin tuneke jixwe!

VALÉRE

Erê, me soz daye ku heta axretê em yê hev in.

HARPAGON

Ez jî sond dixwim ku ez ê nehêlim miradê te pê bibe.

VALÉRE

Ji mirinê pê ve kesek nikare destê me ji hev bike.

HARPAGON

Tu ji xwe re li vî teresî binêre, çawa bi pereyên min ve bûye dirî!

VALÉRE

Min berê jî ji te re got, Mîrza, min ne ji bo berjevendiyeke tiştêkî wiha kiriye. Tiştê ku tu lê difikirî bi qasî serê derziyê jî resir li dilê min nekiriye, min ji ber sedemeke hîn esîltir biryareke wiha daye.

HARPAGON

Hûn dibînin, tu dibêjî qey ji bo xêra xwe bi min bike dixwaze bibe xwediye malê min; lê ez dizanim ku ez ê çi bînim serê wî; him edalet jî dê tiştê ku kiriye di dev û bêvilên wî re bîne helbet.

VALÉRE

Tu çawa dixwazî wiha bike, ez amade me çi cezayê ku tu li min rew a bibînî bikşînim; lê ez hêvî û ricayê ji te dikim, divê tu ji Xwedê bawer bikî ku gunehêk li vê navê hebe ew jî yê min e, qet tu gunehê keça te di vê meselê de tune.

HARPAGON

Helbet ez bawer dikim, rast e; ku têkiliya keça min jî bi vê cî-nayetê hebûya jixwe qebhehetek ji vê mezintir tunebû. Lê divê malê min disa têkeve destê min, te ew bi ku de revand, bi ku de bir, ka ji min re bêje.

VALÉRE

Min? Min ew bi derekê de nebiriye, hîn li mala te ye.

HARPAGON

(Di ber xwe de)

Oy pêştexta min a delalî!

(Bi dengê bilind)

Ji hundirê min bi derekê de neçûye?

VALÉRE

Na, Mîrza.

HARPAGON

Hê! Li min binêre! Ka bêje, te destê xwe pê kiriye yan na?

VALÉRE

Min, destê xwe pê kiribe? Ax! Tu neheqiyê lê dikî, her wiha neheqiyê li min jî dikî; him ez bi hisên herî saf û herî paqij bi agirê evîna wê dişewitim.

HARPAGON

Tu bi agirê evîna pêştexta min dişewitî!

VALÉRE

Ji dêvla ku ez ê destê xwe bi namûsa wê bikim, rûmeta wê bişkînim ez bimirîm ji min re çêtir e. Ew ji alî vî hawî de pir paqij û pir birûmet e.

HARPAGON

(Di ber xwe de)

Pêştexta min pirr birûmet e!

VALÉRE

Ez dixwazim ku hertim li ber çavên min be, ez lê binêrim; agirê evîna dilê min ê ji ber çavên wê yên xezalî bi tu gunehî reş nebûye.

HARPAGON

(Xwe bixwe)

Çavên xezalî yên pêştexta min! Tu dibêjî qey ciwamêr behsa hezkirya xwe, dostika xwe dike.

VALÉRE

Mîrza, Clauda qewraş rastiya vê meselê dizane û ancax ew dika-re li me şahidiyê bide...

HARPAGON

Çi? Qewraşa min ji we re antaxî kiriye?

VALÉRE

Erê, Mîrza, gava ku me soz da hev ew li cem me bû, Xwedê şahid ew şahida me ye; helbet piştî ku baweriya xwe bi rastî û paqijiya evîna min anî, alîkariya me kir, bi saya wê min evîna dilê xwe ji keça te re vekir û baweriya wê bi rastiya vê meselê anî.

HARPAGON

(Di ber xwe de)

Wî? Qey vî teresî ji tirsî ku wê ceza bixwe hişê xwe berda?

(ji Valère re)

Tu çima keça min tevî vî karî dikî?

VALÉRE

Mîrza, ez dibêjim ku heta min baweriya keça te ya birûmet bi qebûlkirina evîna xwe anî, ez çûm heta dinyaya wî alî û hatim.

HARPAGON

Rûmeta kê?

VALÉRE

Ya keça te; ancax duh biryara xwe da ku em seneda zewaca xwe bi hev re imze bikin.

HARPAGON

Keça min, seneda zewaca bi te re imze kir!

VALÉRE

Erê, Mîrza, min jî soza zewacê dayê û sened imze kir.

HARPAGON

Ji bo Xwedê! Îcar ev ji min kêr bû!

HOSTE JACQUES

(*Ji komser re*)

Binivîse, Mîrza, binivîse.

HARPAGON

Tu ji xwe re li tiştê hatiye serê min binêre! Ev çi misûbetî bû bi serê min de hat! Heydê, Mîrza binê bê çi pêdivîye, karê xwe bike, ji dizî û çavberdana namûsê di derheqê wî de zebtê girê bide.

VALÉRE

Min tu tiştên wiha heq nekirine ku hûn têxin situyê min; gava ku hûn tegihîştin bê ez kî me...

Sehneya Çaran

(*Élise, Mariane, Frosine, Harpagon, Valère, Hoste Jacques, Komîser, Katibê Wî*)

HARPAGON

Ax! Keça bêrûmet heywax! Qey tu ne layiqî havekî wek min bûyî! Şî-retên ku min li te kiribûn te yê wiha pêk baniya? Tu diqî dilê xwe dixî dizekî nankor û tu bêyî riza min sozan didiyê? Lê hûn herdu jî beleheq dilê xwe xweş nekin.

(*Ji Élise re*)

Ku min tu xistî nav çar diwaran tu yê hibînî ku dinya çawa ye;

(*Ji Valère re*)

yê te jî mekrohiya ku te kiriye ancax bi sêdarê safî bibe.

VALÉRE

Kesê ku dê di derheqê min de biryarê bide ne xulamê te ye û ku di derheqê min de hukmekî bide jî, dê hikêmanî guhdariya min jî bike.

HARPAGON

Devê min şaş bû ku min got sêdar, ew jî ji bo te hindik e, wê

te bi saxî têxin çerxa îşkencê.

ÉLISE

(Li ser çongan li ber bavê xwe)

Heywax! Bavo, ez bi qurbana te me, bila hinekî dilê te bi me bişewite û heqê xwe yê bavîtiyê ewqas bi bêmirwetî bikar neyne. Wiha çavgirtî hêrs nebe, hinekî li tiştê ku tu dixwazî bikî bifikire. Piçekî bifikire, zanibe bê kesê ku tu pê re ewqas hêrs dibî kî ye. Weke ku tu jê şikê dikî ew qet ne mirovekî xerab e. Vê jî baş zanibe ku ne ew bûna te niha ji zû de ez jî winda kiribûm, gava ku tu vê yekê hîn bibî ez bawer dikim soza ku min dayiyê dê bi te jî seyr neyê. Erê, bavo, weke ku tu jî zanî gava ez ketim avê û dikira li ber ava lê biçûma kesê ku ez xelas kirim ew e, kesê ku tu deyndarê wî û ruhê keça xweyî ew bixwe ye, wê gavê...

HARPAGON

Dev ji van çîrokan berde; ji dêvla ku wê ev bobelat baniya serê min xwezî tu xelas nekiribûna, tu miribûyayî û ez ji rûçikê te xelas bûbûma.

ÉLISE

Bavo, bi ser serê te bigerim, ji bo xatirê Xwedê, ku hinekî jî dilê te bi min dişewite...

HARPAGON

Hiş be, bila peyveke din a wiha ji devê te dernekeve; divê heq heqê xwe bibîne, edalet bê cih.

HOSTE JACQUES

(Di ber xwe de)

De bixwe îcar, bê ew darên ku te li min dixistin çawa bûn.

FROSINE

(Di ber xwe de)

Vaye ji te re karekî seyr ku ga û gêre tê negere.

Sehneya Pêncan

*(Anselme, Harpagon, Élise, Mariane, Frostine, Valère, Hoste
Jacques, Komîser, Katibê Wî)*

ANSELME

Çi bûye, çi qewimiye, senyor Harpagon? Ez dibînim tu pîrî hêrs bûyî.

HARPAGON

Ax! Senyor Anselme, tu halê min dibînî kesekî weke min bed-bext heye gelo? Were bi çavê serê xwe bibîne di mesela mah-ra te ya ku me yê bibiriya de çi asteng, çi tevlîhevî derketine! Hemû dewlemendiya min dizîne, namûsa min anîne pênc pe-ran û ev e teresek, bênamûsek hate bixulamtî kete nav mala min, tecawizî hemû tiştên min ên pîroz kir, perê min dizî û bi dora keça min ket ew ji rê bir.

VALÈRE

Hişê kê li ser perê te ye, ku te ji limêj de serî û guh ji me kir?

HARPAGON

Erê, xwedêgiravî soz û peyman a zewacê dane hev. Zirara vê yekê hinekî jî digihîje te, senyor Anselme, him divê tu ji niha û pê ve pêşiya wî bernedî û hemû mesrefên dadgehê bidî da ku heyfa rezaleta ku derxistiye jê hilînî.*

ANSELME

Tu niyeteke min a ku ez zorê li hinekan bikim û bi wan re

* Harpagon ji bo keça xwe bide Anselme soz dayiyê û tevî rezaleta ku hatiye serê wî jî, li mahneyeke peritî digere ku mesrefêke wêk ya dadgehê ya ewqas biçûk jî têxe stuyê hinekî din.

bizewicim û tu hêviyekê ji dilê keseke ku dilê wê di hinekî din de heye bikim jî tune; lê tevî vê jî, ji bo xatirê te ez dîsa dikarim karê te weke yê min be taqîb bikim.

HARPAGON

Ev e, Mîrza komîserekî pir dilsoz e, dibêje ku ew e karê xwe jî birêkûpêkî bicih bîne. Îfadeya wî baş bişidînin, Mîrza, jê re ravebikin ku sûcê kiriyê çend mezin e.

VALÉRE

Ez qet tènagihîjim ku çawa hezkirina min a ji keça te dibê sûc, dibe cinayet û tu dibêjî ji ber ku me di nav xwe de soz daye hev ez ê cezayekî mezin bixwim, lê gava derkeve rastê ku ez kî me...

HARPAGON

Ev çîrokên wiha ne li ser guhekî min in; îroj ji dizên biesl û fesil, ji sextekarên binav û nîşan mirov nikare bişeqe, herkesê ku fersenda esl û feslê xwe yê ji alî kesî ve nayê zanin bidest dixe, navekî ji wan navên mezin li xwe dike û derdikeve meydanê, dibêje ez filan lawê filên im.

VALÉRE

Divê tu vê yekê baş zanibî, ku ez di mala xwe de têr im û ne mirovê ku tenezulî tiştê ne yê min be bikim. Bajarê Naples (Napolî) hemû dikare ji min re şahîdiyê bide ku ez lawê kê me û ji kîjan malbatê me.

ANSELME

Hela hinekî hêdî be! Li peyvên ku wê ji devê te derkevin miqate be. Haya te ji bayê felekê tune; tu li neqeha xerab rast hatî; tu zaro-kan li hemberî xwe dibînî, ez jî hemû bajarê Naplesê nas dikim û berî ku gotin ji devê te derkeve ez dizanim ku tu yê çi bibêjî.

VALÉRE

(Biqureti şewqa xwe dide serê xwe)

Ez ne mirovê ku çavê xwe ji tiştê bitirsînim, ku tu hemû bajarê

Naplesê nas dikî, helbet niha tu rahmetiyê Dom Thomas d'Alburcy jî nas dikî.

ANSELME

Bêşik, ez wî baş nas dikim; kesekî ku wî ji min baştir nas bike tune-ye.

HARPAGON

Ji min re çi, ez ne Dom Thomas ne jî Dom Martin nas dikim.*

ANSELME

Tu bi xatirê Xwedê kî bihêle bê çi dibêje, em ê niha jê fêm bikin ku dixwaze çi bêje.

VALÉRE

Min dixwest ku ez bêjim ew havê min bû, ez lawê wî me.

ANSELME

Ew havê te ye?

VALÉRE

Erê, havê min e.

ANSELME

De heydê; qey tu henekê xwe bi me dikî, îcar ev çi derew in. Ji xwe re çirokeke din bibêje, ku bikeve hiş û aqilên mirov û nebêje qey ku ez ê karibim xwe bi sextekariyeke wiha xelas bikim.

VALÉRE

Hinekî zanibe bê çi ji devê te derdikeve, xweşik bipeyive. Min navê ku ez sextekariyê bikim; tişteki ku ez nikaribim îşbat bikim ez nabêjim.

Di çapa 1682-yan de ev izah heye : (Gava du şemalên vêxistî dibêne yekê ji wan vedimirine.) Belkî ev liska sehnê ya ku ji dema Molière maye paşê zêde hatibe mezin kirin. Heste Jacques şemalê ji nû ve vêdixe, Harpagon dişa vedimirine û ev yek çar caran tê dubarekirin.

ANSELME

Çi? Tu bi çi curetî dibêjî ku tu lawê Dom Thomas d'Alburcy ?

VALÉRE

Erê, ez bi çi curetî dibêjim ez ê bêjim û vê rastiye hûn çawa dixwazin ez hazirim ku îsbat bikim.

ANSELME

Weleh tu mêrxas î. Divê ez vê ji te re bêjim, wê gavê belkî tu hinekî ji tiştê ku dibêjî şerm bikî; mirovê ku tu behsa wî dikî, ev şazdeh salên wî bûn ku dema tevliheviyên Naplesê, weke gelek esilzadeyên din, ji bo ku canê xwe xelas bikin li gel jin û zarokên xwe direvin dikevin bahrê û tevde difetisin, dimrin.

VALÉRE

Erê, lê tu jî guhdariya min bike, belkî tu hinekî ji ber xwe fedî bikî; lawê wî yê ku wê çaxê heft salî bû li gel xulamêkî wî, ji aliyê keştiyeke îspanî ve hate xelaskirin, ew lawik ev kesê ku tu niha pê re dipiyivî bixwe ye; vê jî zaniye ku dilê kaptanê wê keştiyê bi min şewitî, li min xwedî derket û ez wek lawê xwe mezin kirim. Û gava ez gihiştim çaxa ku karibim rahêjim çekê, min her cûre çek bikar anî; min digot qey bavê min miriye, lê herî niha ne bi tiştêkî ez hîn bûm ku nemiriye; ji bo ku lê bigerim ez di vir re derbas dibûm, qedera min bû, qey Xwedê li eniya min nivîsî bû, ez li Elisa delal rast hatim; gava min ew dît ez bûm sermest û serwendayê xweşîkbûn û sipehîtiya wê; ji her hesreta evîna wê û serhişkiya bavê wê, ez mechûr mam têkevim xizmeta bavê wê û kesekî din bişînin ku li dê û bavê min bigere.

ANSELME

Lê ji xeynî peyva devê te, çi delîlên din di destê te de hene ku em bawer bikin û bêjin ev ne çîrokek e, ku li ser hingeha rastiyeke hatiye ava kirin?

VALÉRE

Kaptanê îspanî; mohreke aqûd a havê min; hazinekî eqîq ku diya min xistibû destê min; Pedroyê kal, xulamê havê min ê ku bi min re ji qezayê xelas bûbû.

MARIANE

Heywax! Tu ji xwe re çi dibêji, piştî ku min ev peyvên te bihîstin ez ê bixwe ji bo te şahidiyê bidim ku tu qet derewan nakî û tiştê ku tu dibêji eşkere ye, ji herkesî ve eyan e ku tu kekê min î.

VALÉRE

Nexwe tu jî xwişka min î?

MARIANE

Erê, gava te devê xwe vekir û dest bi peyvê kir dilê min ji jêr de lêxist; belkî min çîroka bahoza ku bi serê malbata me de hatiye hezar carî ji diya xwe bihîstiye, ku te bibîne wê ji kêfan bîfire. Ji wê qezaya bêyom em jî, bi saya Xwedê spî sax filitîn; lê jiyana me bi saya jîdest clana azadiya me rizgar bû; gava ez û diya xwe li ser textekî ji keştiya me ketibû her bi avê de diçûn korsanan em girtin. Piştî deh salên koletiyê, qey Xwedê ji me re lihev anî em azad bûn û vegeriyan Naplesê, lê bêyî ku em xebereke xêrê ji havê min bibihîzin me dît ku hemû mal û milkê me firotine. Ji bo ku diya min çend qurûşan ji mal û milkên ku di destê xelkê de mabû bistîne, em derbasî Gênesê (Cenova) bûn, ji wir jî, diya min nalet li nemerdiyên xizmên xwe anî û hate van deran, ku ji wê rojê û vir de jî me her xwe nediye.

ANSELME

Hawar e Xwedê! Hukmê te çendî mezin e! Tu çendî xweşik rê mirov didî ku bi tenê tu dikarî mucizatan çêkî! Werin himêza min, keça min, lawê min û çawa ku ez bi we şad dibim hûn jî wiha bi havê xwe şad bibin.

VALÉRE

Tu, havê me yî?

MARIANE

Yê ku diya min ewqas bi ser de dida girî tu yî?

ANSELME

Erê, keça min, erê, lawê min, ez Dom Thomas d'Alburcy me, li gel hemû serweta xwe sax û silamet ji deryayê filitûm, ev serê şaz-deh sal min digot qey hûn hemû mirine, piştî ku bi salan li serê rê û dirban, li xerîbî û xurbetê geriyam, niyeta min hebû ku ez keçeke bîaqil ji malên malmezîninan ji xwe re bînim û ji nû ve malekê çêkim. Ji ber ku min vegera Naplesê ji xwe re xeter didît, min pêvendiya xwe bi wir re bi tevayî birî, min ji xwe re riyek dît mal û milkê min ê li wir mabû jî gişt firot û bi navê Anselme li vir bicih bûm, ji ber ku min dixwest ez ji navê xwe yê berê ku ewqas karesat anîn serê min û bû sebebê ewqas kul û derdan xelas bibim.

HARPAGON

Nexwe ev lawê te ye?

ANSELME

Erê.

HARPAGON

Wê gavê ez dawakarê te me, divê tu deh hezar ekuyê ku ji min diziye aniha bînî.

ANSELME

Wî, diziya te kiriye?

HARPAGON

Erê, wî bixwe.

VALÉRE

Kê ji te re got?

HARPAGON

Hoste Jacques.

VALÉRE

Te jê re gotiye?

HOSTE JACQUES

Tu dibînî ku min devê xwe jî venekiriye.

HARPAGON

Erê, vaye mîrza Komîser jî îfadeya wî girtiye.

VALÉRE

Tu bêrûmetiyeke wiha layiqî min dibînî?

HARPAGON

Ez layiqê te bibînim an nebînim, ez perê xwe dixwazim.

Sehneya Şeşan

(Clèante, Élise, Valère, Mariane, Anselme, Frosine, Harpagon, Anselme, Hoste Jacques, La Fleche, Komîser, Katibê Wî)

CLÉANTE

Bavo, qet netirse û nekeve ber gunehê kesî. Ez dizanim ku pereyên te li ku ne û ez hatim vir ku ji te re bêjim, ger tu bihêlî ku ez bi Marianeyê re bizewicim, dê perê te aniha bigihîje ber destê te.

HARPAGON

Li ku ye?

CLÉANTE

Qet xeman nexwe. Perê te li cîhekî saxlem e, divê tu ji min

bawer bikî, hertişt bi min ve girêdayî ye. Divê tu biryara xwe bidî û ji min re bibêjî; tu çî dixwazî bêje, yan divê tu Marianeyê bidî min, yan jî divê tu destê xwe ji pêştextê bişoyî.

HARPAGON

Kesî destê xwe nedaye peran?

CLÉANTE

Qet kesî jî destê xwe nedaye wan. Binêre tu dizanî, tu dixwazî destûra me bide ku em bizewicin, tu nedî diya wê tê xeber nade, jê re gotiye ku tu ji herduyan kijanî dixwazî tu serbestî, ku tu jî destûra me bidî mesele hal dibe dere.

MARIANE

Haya te jê tune ye ku destûra wî bi tenê têrê nake, Xwedê li gel vî bi-rayê min ê ku tu dibînî miradê min bi havê min jî kir, divê tu riza wan jî bixwazî.

ANSELME

Berxên min, Xwedê, ji bo ku ez bibim kelem li peşîya daxwazên we, miradê min bi we nekiriye. Senyor Harpagon, divê tu jî teqdir bikî ku dê daxwaza keçeke ciwan, ji bo zewacê ji havê bêtir ji bo lawê wî be. Heydê, bila kesekî din binebaşî behsa te neke û peyvên nexweş disa neyên guhê te û ji bo van herdû mahran tu jî wek min bi dilekî rihet destûrê bide.

HARPAGON

Ji bo ku ez destûrê bidim, divê ez berî pêştexta xwe bibînim.

CLÉANTE

Tu yê bibînî ku hîn kesî jî destê xwe pê nekiriye.

HARPAGON

Pênc qurûş perê min ê ku ez ji bo dawetê bidim zarokên xwe jî bi min re tune ye.

ANSELME

Tu ji xwe re çi dibêji! Bi min re heye, ez ê bidim wan; tu qet mereqan neke.

HARPAGON

Tu mesrefa van her du dawetan ji didî ser xwe?

ANSELME

Erê, ez didim ser xwe; dilê te rihet bû?

HARPAGON

Erê, lê hişertê ku tu ji bo dawetan ji min re ji bedlek cil çêbikî.

ANSELME

Ser çavê min. Heydê em herin kêf û şahiyê bikin, dilê xwe li vê roja bextewer rihet bikin.

KOMÎSER

Hê yawel! Mîrza, hela rawestin! Ji kerema xwe re, ecele nekin bavên min. Kî dê xercê zehitên me bide?

HARPAGON

Êdî, em ê çibikin ji zehitên te.

KOMÎSER

Baş e, lê ez ji ne xulamê havê kesî me, ku min ewqas zehmet kişand.

HARPAGON

(Hoste Jacques nîşan dide) Ji bo ku te ewqas zahmetî kişandiye, vaye ez vî mêrikî didim te hibe ji xwe re bi dar da ke.

HOSTE JACQUES

Heyhat! Divê ez çi bikim, çi xweliyê li serê xwe û bavê xwe bikim? Ez rast dibêjim daran ji xwe dadiweşînim, derewan dikim dixwazin min bi dar da kin.

ANSELME

Senyor Harpagon, vê carê li gunehê wî hibore.

HARPAGON

Tu dê xercê Komîser jî bidî?

ANSELME

Bila ew jî wek te be. Heydî em niha herin vê mizgîna xweş bidin dîya we jî.

HARPAGON

Ez jî, biçim bi pêştexta xwe ya delalî şa bibim.

Biyografiya Molière

- 1622 *15-ê Çilleya Paşîn* - Li Parisê ji diya xwe dibe. Bavê wî yê raxer navê Jean-Baptiste Poquelin de Molière lê dike.
- 1636-1640 Li Parisê, li koleja Clermont dixwîne.
- 1643 *30-ê Hezîranê*. - Koma xwecih a Illustre-Theatre tê avakirin. Moliêrê paşerojê (wiha xwiya ye ku salên pêşîn ev nasnav bîkar neaniye) û Madeleine Béjart li gel hevalên xwe peymanî avakirina vê sazîyê îmze dikin. Cara pêşîn, di 1-ê Çilleya Paşîn a 1644-an de, di lîska topê ya bi navê Métayers de derdikevin pêşberî bîneran; paşê di 19-ê Çilleya Pêşîn a eynî salê de derbasî koma Croix Noire dibin. Lê zêde najo kumpanya têk diçe (Molière, di navbera 2 û 4-ê Tebaxa 1645-an de, ji ber deynan dikeve hefsê). Kumpanya mecbûr dimîne belav dibe.
- 1646-1658 Molière û Madeleine Béjart derdikevin melbendê, pêşî di koma bi serokatiya Charles Du Fresne de dilîzin, ku patronê wê Duc d'Epemon e, paşê di kumpanya ku ew bixwe îdare dikin û ji 1653-yan hete 1657-an ji alî mîr Conty ve hatiye parastin de dilîzîn.
- 1655 Pêşkêşkirina *L'Etourdi*, li Lyonê.
- 1656 Pêşkêşkirina *Depit amoureux*, li Béziersê.
- 1658 *24-ê Çiriya Pêşîn*. - Kom vedigere Parisê, û êdî ji aliyê Mîrza, birayê Louisê XIV. ve tê parastin, li hola muhafîzên kevn a Louvrê, li pêş Louisê XIV. trajediya Corneille *Nicomède* dilîze. Paşê *Docteur amoureux* bi hin dans û sitranên piçûk ên di navbera perdeyan de ku ji alî Molière ve li melbendê lê hatibûn zêdekirin dilîze û bi saya serketina di warê komediyê de hola Petit Bourbon bi komediyên

Îtalî re par vedike.

- 1659 *18-ê Çiriya Paşîn. - Les Precieuses ridicules.*
- 1660 *28-ê Gulanê. - Sganarelle ou le Coucu imaginaire .*
11-ê Çiriya Pêşîn. - Bêyî ku berî jê re bê gotin, ji aliye M. de Ratabon ve ji teatra wî ya ku wê bê xirakirin tê derxistin, lê li heberî vê hola Palais-Royal didinê.
- 1661 *4-ê Sibatê. - Dom Garcie de Navarre ou le Prince jaloux.*
24-ê Hezîranê. - L'Ecole des maris.
17-ê Tebaxê. - Afrandina Fâcheux li Vaux-le-Vicomtê, ku dema cejnê ji alî nazir Foucquet ve ji qirêl re hate pêşkêş kirin.
- 1662 *20-ê Sibatê. - Zewaca Molière û Armande Béjart, xwişk an, li gor hinekan, keça Madeleine, li Saint-Germain-l'Auxerrois. Peyman di 23-yê Çilleya Paşîn de hatibû îmze kirin.*
26-ê Çilleya Pêşîn. - L'Ecol des femmes.
- 1663 *1-ê Tîrmehê. - La Critique de l'Ecole des femmes.*
 Di navbera 16 û 21-ê Çiriya Pêşîn de. *L'Impromptu de Versailles*, li Versaillesê pêşkêş kir.
- 1664 *19-ê Çilleya Paşîn. - Bûyîna Louis, lawê Molière, ku wî di 28-ê Sibatê de baptîz dike. Parrain: Qiral wî baptîz dike. Marraine: Ji alî Henrietta Îngîltereyî ve tê baptîz kirin.*
29-ê Çilleya Paşîn. - Le Mariage force, li Louvrê hat pêşkêş kirin.
17-ê Nîsanê. - Le Tartuffe Kumpanya Saint-Sacrement tirsand, ev tirs jî bû sebaba ku careke din neyê nîşan dan.
30-ê Nîsanê/22-yê Gulanê. Molière û koma xwe ji bo beşdarî Plaisirs de l'Île enchantée bibe li Versaillesê

bicîh dibin. 8-ê Gulanê, *La Princesse d'Élide* cara pêşîn hate pêşandan. Di 12-an de jî her sê perdeyên *Tartuffe* hatin nîşan dan.

1-ê Tebaxê. - Temamkirina çapa *Le Roi glorieux au monde*, ji alî metran Saint-Barthélemy û Pierre Roulé ve, ku bi dijarî êrîşî afranderê *Tartuffe* dikin. Molière, dereng namîne, bi erzûhala xwe ya yekemîn reaksiyona xwe nîşan dide.

Di navbera 20 û 27-ê Îlonê de. - Her sê perdeyên pêşî yên *Tartuffe*, ji alî Molière û koma wî ve, bi biryara Mîrza birayê wî dema ku qiral Louis XIV. hati-bû serdana birayê xwe, li Villers-Cotterêts hatin pêşkêş kirin.

29-ê Çiriya Paşîn. - *Tartuffe* bi her pênc perdeyên xwe ve li Raincy, li mala Mîr Palatine, ji bo Condé hate pêşkêş kirin.

1965

15-ê Sibatê. - *Dom Juan.*

4-ê Tebaxê. - Keça Molière bi navê Esprit-Madeleine tê batîz kirin.

14-ê Tebaxê. - Koma Molière li Palais-Royal dibe Koma Qirêl û mehaneya wî derdixê 7 000 frankî.

14-ê Îlonê. - *L'Amour médecin* li Versaillesê pêşkêş dike.

8-ê Çiriya Paşîn. - *Le Tartuffe* û *L'Amour médecin* li Raincy, li mala Mîr Palatine bi emrê de Condé tên pêşkêş kirin. Perdeya çaran a *Tartuffe* hîn nehatiye pêşandan, wê demê, hîn şeklê wê yê dawîn nahati-bû dayin.

1665-1666

Jî dawîya meha Çilleya Pêşîn hete dawîya Sibatê. - Molière nexweşê bêhal e. Di Nisana 1667 de sipî sax dibe.

1666

4-ê Hezîranê. - *Le Misanthrope.*

6-ê *Tebaxê*. - *Le Medecin malgré lui*.

2-yê *Çilleya Pêşîn*. - Li Saint-Germain-en -Layeyê, Pêşkêşkirina *Mélicerte*, bi tenê wek du perde di *Ballet des Musses* de cîhê xwe girt û di 5-ê Çilleya Paşîn a 1667-an de ciyê *La Pastorale comique* girt, ku îro wendaye. 10-ê Sibatê dîsa li Saint-Germainê û bi kadirên eynî baleyê, pêşkêş kirina *Sicillen ou l'Amour peintre*.

1667 5-ê *Tebaxê*. - Li Palais-Royal, carekê bitenê pêşkêşkirina *L'Imposteur*, dotira rojê hat qedexekirin. La Thorillière û La Grange wê gavê li gel erzûhala Molière çûn giliyê xwe li bal qiralê ku nû dora Lillê girtibû kirin.

11-ê *Tebaxê*. - Sermetranê Parîsê Hardouin de Péréfixe, fermanekê derdixê û dibêje her kesê ku vê lîskê "bi taybetî an bi awayekî êşkere bilîze, bixwîne an dema bê ravekirin guhdarî bike dê ji dîn bê derxistin (afroz kirin)."

20-ê *Tebaxê*. *Lettre sur la comédie de L'Imposteur*, nameya anonîm di lehê Molière û piyesa wî de.

1668 3-ê *Çilleya Paşîn*. - *Amphitryon*.

4-ê *Adarê*. Molière li hotêla de Conde, Le Tartuffe ji bo Monsieur le Prince dilîze.

15, 16, 18 an jî 19-ê *Tîrmehê*. - *George Dandin*, li Versaillesê, bi kadirên *Grand Divertissement Royal* hate pêşkêşkirin.

9-ê *Îlonê*. - *L'Avare*.

20-ê *Îlonê*. - *Le Tartuffe* li Chantilly ji alî Molière ve, ji bo Condé hate lîstin.

1969 5-ê *Sibatê*. - Tartuffe tê serbestkirin û li Palais-Royal tê nîşandan. Serketineke bêhempa bidest dixê. Dîsa eynî rojê, Molière erzûhala xwe ya sisiyan ji Qirêl re

şand. Komediya ku ji alî Jean Ribou ve hate weşandin, dê di 23-yê Adarê de ji çapê derketa (di 15-ê Adarê de derket).

4-ê Nîsanê. Molière çapa *La Gloire du Valde-Grâce*, ku ji bo wê dostê xwe yê nîgarkêş Mignard kirêkiribû temam dike.

6-ê Çiriya Pêşîn. *Monsieur de Pourceaugnac*, cara pêşîn li Chambordê hate lîstin.

1670

La Critique du Tartuffe, komediya anonîm, li gel *Nameyeke satîrîk a li ser Le Tartuffe ku ji nivîskarê Rexneyê re hatibû nivîsîn*, li Parisê, li cem Gabriel Quinet tê dîtin (Bi tarîxa 19-ê Çiriya Paşîn 1669).

4-ê Sibatê. - *Les Amants magnifiques*, bi munasebeta karnevala li Saint-Germain-en-Laye hate pêşkêşkirin.

14-ê Çiriya Pêşîn. - *Le Bourgeois gentilhomme*, li Chambordê tê lîstin.

1671

17-ê Çiriya Paşîn. - Pêşkêşkirina *Psyché*, li hola des Tuileries.

24-ê Gulanê. - *Les Fourberies de Scapin*.

2-yê Çilleya Pêşîn. - *La Comtesse d'Escarbagnas* cara pêşîn li Saint-Germain-en-Layeyê hate pêşandan, perdeyek ji bo destpêka *Ballet des ballets* hate amadekirin.

1672

11-ê Adarê. - *Les Femmes savantes*.

1-ê Çiriya Pêşîn. - Babtîzkirina Pierre-Jean-Baptiste-Armand Poquelin, lawê Molière. Lawikê nûbûyî di 12-ê eynî mehê de dimre û tê veşartin.

1673

10-ê Sibatê. - *Le Malade imaginaire*.

17-ê Sibatê. - *Le malade imaginaire* cara çaran hate pêşandan. Moliêrê ku rolê Argan girtibû ser xwe, li ser sehnê dikeve dilê wî lê diçe, piştî ku wî radikin

tînin mala wî ya li kolana Richelieu bi çend saetan dimre. Keşeyê Saint-Eustacheyê veşartina wî ya li gor adetên xiristiyanî red dike. Li ser rica jina wî Armandeyê ji Lûisê XIV. li Versaillesê, Molière bi şev, bêseremonî û qerebalixî, li goristana Saint-Josephê tê veşartin.

1682

30-ê Hezîranê. - Çapa di ber çavan re derbaskirî, sererastkirî û berfirehkirî ya Les Œuvres de Monsieur de Molière (Kulliyata Molière), weke çar bergan, bi aweyekî tekûz û bi pêşgotineke girîng ji alî La Grange û Vivot ve hate temamkirin. Du bergên din ên ku ji berhemên wî yê neçapkirî pêkhatibûn jî di 31-ê Çiriya Pêşîn de hatin çapkirin.



Selefxwer Harpagon çikûsekî ewende, çavê wî ji malê dinyayê têr nabe û kirêt e ku perên xwe ji xwe û zarokên xwe jî vedişêre, dixê bîn erdê; tevî temenê xwe yê şêstsalî û keftariya xwe dixwaze dildara lawê xwe ji xwe re bîne, ji lawê xwe re jî jinebiyekê bîne û keça xwe ya ciwan jî bide kalekî dewlemend. Di mesela zewacê de jî, ji ber çavçikûsiya xwe, dike mala xwe û ya zarokên xwe jî bi destê xwe xera bike, lê jê re li hev tê û bi saya comerdiya xizmên xwe ji vê rewşa trajîkomik bi hêsanî rizgar dibe.

Kesayetiyên mezin ên Molière yên wekî; M. Jourdain, Argan, Alceste, Tartuffe û yên mayî hemî jî tevî zefên xwe hin aliyên wan ên mirovî hene, hinekî dilê mirov bi wan dişewite û ev yek jî rê nade ku mirov bi xwe bigire bi lewçetî û qeşmeriyên wan bikene.

Harpagon kesayetiyêke wiha ye ku ji van kesayetiyên navborî hemîyan cihê ye. Ew jî hemî hîsên mirovî; yên bavîtiyê, dostaniyê, xirabî û qenciyê, mêrxasî û tirsonekiyê bêpar e. Ew bi tenê mirovekî çikûs û nekes e. Çi bikin jê, çi bê serê wî ew disa çikûs, pîntî, dilkevir û selefxwer e. Mezinahî, giranî ji bo wî bêmâne ye. Ew sermest û serwendayê çikûsiyê ye.

Gava kenê mirov tîne, kesek nikare rê li ber bigire û bide rawestandî. Lê ev yek ne li ser guhekî Harpagon e, ew qet li xwe jî ho venade. Wekî me got, heşê wî fikra wî her li ser çikûsiyê ye.

